


Li gorî projeya amadekarên çalakiyê, wê li Enqere, Dilok û Ruhayê gel bihata pêrgîniya Heyeta Aştiyê. Dewletê jî li gorî vê projeyê senaryoya xwe amade kiribû, gel li ku biciviya diviyabû bihata belavkirin. Mixabin ev yek li Enqereyê pêk hat. Aşîxwazên ku jî bo pêşwazîkirina heyetê li Gölbaşıya Enqereyê civiya bûn jî hêla fîmên taybet û polîsan ve hatin belavkirin. Digel hemû tiştan gel pêşwazîkirin xistibû mejiyê xwe û bi saetan li hêviya heyetê ma. Saet dehê êvarî nezikî 600 kesî em pêşwazî kirin. Li vir daxwaza aşîxwazan bi ser ya hêzên dewletê ketibû.

Rûpel 8 - 9

**Nûçe:**

Bila "Zarokên Rojê" nebin
"Zarokên Kûçeyan"

Rûpel 3

Zülküf Kışanak:

Soresger Çeto
Çetin Sonkurt

Rûpel 6

Dr. Zerdest Haco:

PEN'a Navneteweyî û
PEN'a Kurd

Rûpel 4 - 5

NAVEROK



Azad Avaşîn: Di mîzaha kurdî de tîpeke taybet: Gurî

7



Helbetine Bjarte

10



Zimanê Min
Kurdi ye

Jî Înstîtuya Kurdî ya Stokholmê
berhemeke perwerdehiyê

13

Ji Xwendevanan

XWÎŞK û birayên hêja me careke din rûyê dijminê xwînmij dît û dijmin bi zelalî rûyê xwe yê şerxwaz da ber çavên cihanê. Bi rastî ev ne tiştekî xerîb bû di dîroka komara tirk de rejîm heya îro tim û tim bi xwîne li ser piyan maye.

Wekî çawa însan bêav, dinya bêtav masî bêav; dijminê gelê me jî bêxwîn najî. Ku wisa ye pêwîst e ku em ji dijmin tu tiştî hêvî nekin û em xwe bispêrin Teverga Azadiyê. Êdî bes e em ji xelkê re ked bikin, xizmet bikin. Serokatî bang dike xelasiya gelê kurd di yekîtiyê de ye. Îro em dibînin dinya li ser pîrsgirêka gelê me sekiniye, lê mixabin hin însanên me di nav xeyalên kûr û dirêj de ne, hayan jî welatê wan nîn e. Îro em dibînin dijmin paytexta gelê me ji gelê me û dostên me yên azadixwaz û aştxwaz re qedexe dike. Çima gelo? Ji ber ku dijmin ji kevokên aştiyê dijişse. Ji ber ku ev bayê 29'an e. Serokomar Demirel, digot 28 caran kurdana serê xwe rakir lê me serê wan tewan, ve carê jî wê wilo be. Lê belê Demirel xwe û gelê xwe dixapîne. Ev bayê 29'an, qîz û xortên Kurdistanê ji nû ve afirandine û qedera gelê kurd guhartiye û di Rojhilata Navîn de bûye mîftiya azadiya getan.

Êdî nema gurên hoz dikarin vî bayî rawestînin, bayê 29'an Mazlum, Kemal, Xeyrî, Ferhat, Zilan, Zekiye, Bermal, Besê, Leyla hin bi dehan şehîdên bênav afirandine. Ne gengaz e ev ba bisekine.

SOZDAR BEMAL / GEBZE



Ker kerê berê...

SAMI TAN

Gelê me dema dibîne ku tu guherîn di kesekî de çênebûye vê gotina li jorê bi kar tîne. Serokomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel ev 30 sal e ku di qada siyasî de konê xwe vedaye. Bi gotinên xwe yên hev û din nagirin, navdar e. "Duh duh bû, îro jî îro ye." gotina wî ya bi navûdeng e. Gotina wî ya rojekê, ya roja din nagire. Ew bi xwe jî bi vê yekê dizane, lewre jî wî di civînekê de dabû zanîn ku roj guheriye, lewre gotina wî guheriye.

Belkî hinek bibêjin, "Ev zîlam gelêkî bêhawa ye", lê bîr û baweriyên wî yên li ser rejîmê qet neguherîne. Her wekî xwe mane. Demirel tim jî bo parastina berjewendiyên çînen serdest xebat kiriye. Berî 12'yê rezberê di kovara Girgîrê de karikatûrên wî derketin, di karikatûrêkî de ew wekî "dayik" hatibû xêzkirin, wê dayikê her du memikên xwe xistibûn devê zarokê dewlemendan û li hêla din zarokêkî xizanan bi destê xwe def dida, nedihîşt ku ew here û şîr bimije. Özalê ku

digot "Ez ji dewlemendan hez dikim." şagirtê Demirel bû. Ew ji wî hîfî vî qaydeyî bûbû.

Taybetiyeke serokomarê tirk ku bûye mijara pêkenokan jî, helwesta wî ya li hemberî leşkeran e. Tê gotin ku li hemberî leşkeran ziravê wî diqete, lewma jî du caran leşkeran ew ji serkar daxistine, wî bêdeng rahişt şewqeya xwe û çû. Di dema cuntayê de hate gotin ku, Demirel guheriye, bûye demokrat, lê wî di demeke kin de bi gotin û kirinên xwe ew kes derewîn derxistin.

Ev zîlam piştî ku bû serokomar, her tim guhên wî li ser gotinên leşkeran bel in û çavên wî jî li ser tevger û bizavên wan beloq in. Li gorî daxwaza leşkeran çî pêwîst be dike û dide kirin. Di avakirina hikûmeta nû de destkariya wî eşkere bû. Ji ber ku leşkeran têkiliyên xwe bi Tansu Çillerê re qut kirin, wî jî rû neda wê. Li ser vê yekê Tansu Çillerê ew wekî 'serokçete' bi nav kir û got: "Kesên ku em ji serkar xistin, hêzên li pişt çeteyên Susurlukê

jî ew in."

"Çoban Silo" dema pêwîst be hinek manevrayan dike. Piştî ku di 1991 de hate serkar, çû Kurdistanê û "rastî ya kurdan" nas kir. Bi vê yekê re jî "serrekî giştî" li hemberî gelê kurd dest pê kir. Bi milyonan kes ji cih û warê xwe bûn, bi hezaran kes ji hêla kontrayan ve hatin kuştin û ew kirin hê jî dido min.

Niha heman zîlamê ku rastiya kurdan nas kiribû, bêyî ku xwe biêşîne, hebûna kurdan înkâr dike. Ew li hemberî gotinên Serokê HADEP'ê Murat Bozlak, ên bi rengê "Li Tirkiyeyê kêşeya bingehîn, kêşeya kurd e", dide zanîn ku "Li Tirkiyeyê kêşeya kurd nîn e, lê kêşeya terorê heye." Dîsa ew li hemberî gotinên Serokê DBP'ê Refik Karakoç; "li ser gelê herêmê pest û pêkutî heye", piştigiriya terora dewleta dike û dibêje: "Qesta we ji pest û pêkutiyê çî ye? Dewleta me ji bo parastina sînorên xwe li dijî terorê ser dike."

Ev gotinên Demirel didin zanîn ku deriyê wan ji aştiyê re girtiye. Heta ku ew derî bê vekirin, wê pir xwîn birije. Ev rewş, gotinên helbesteke Can Yücel tîne bîra mirov: Lê, fêm naka canbaz, ku veneke deriyê ku em lê didin! Emê bibezin ser vê qada ku jê re dibêjin dîrok û vî derî bi destê xwe vekin.

Bi gurebozan re doza aştiyê nameşe

KAWA NEMIR

Gelên bindest ên Rojhilata Navîn, ber bi berebûneke (enîbûn) nû ve diherin. Ji mêj ve tê zanîn ku Komara Tirk (KT), Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) û Îsraîl bereyekî li ser hîmê mêtîngerî û çewsandinên nû ava dikin û ji mêj ve bûne destbirakên hev û din. Lê belê derfetên hevalbendiya gelên hevêrkê (herêm) jî, li ser hîmê dijîtiya dûgelên (dewletên) "belayên reş" hêdi hêdi tê pê.

Teverga Neteweyî ya Kurdistanê bi geşkirina şerê azadiyê dibe xewnerêşka pergala dagirker. Dîroka îroyîn û rûdanên têvel ên teverga gelê me, de bi van derfetên leşkerî û siyasî bêhna mîjadperestan biçikîne. Di vê pêvajoyê de di pêgiha leşkerî û konevanî de du rûdanên pir girîng serê dagirkeran diêşînin û nemaze KT her ku gavên nû diavêje çewtiyên mezintir dike. Ji van rûdanan yek ku rojeva hikûmetê ji niha ve dagir kiriye, bicîhbûna gerîla li Behra Reş e. Ziravê wan qetiyaye; bawer nakin û kujyarên xwe ber bi Bakur ve belav dikin. Tê dîtin ku bîngeheke şoreşger de di vê sala finalê de destkeftinên pir girîng bîne. Hişyarkirina gelên mîna laz, gurgî çerkez û hwd. bi destê Teverga Azadiyê pêk tê. Ev jî enternasyonalîstî û zanistîya tevgerê nîşan dike. Ji çepgi-

Gelê me dizanibû ku bi van faşîstan re aşî nabe, ji ber ku aşî mirina xwînmijan e. Lê pêwîst bû ku gelê kurd careke din piştî du agirbestan keyseke nû bida wan.

rên tirk re bangê hebû: "Werin çiyayên Kurdistanê. Gerilayên xwe derxin çiyayên Anatoliyê. Em dê her alîkariyê ji we re bikin." Xuya ye ev pêla dengvedayî dê bîngeha hevkarîyeke bêhempa ava bike û rizgariya gelên din dê ji Mezopotamyayê dest pê bike.

Bûyera duyemîn Trêna Aştiyê ye. Ji ber astengkirinên hikûmeta tirk û alman trêna neçû Amedê. Digel vê qasê, aştxwazên ku beşdarî vê çalakîyê bûbûn bi balafirên hatin Stenbolê û ji laşê bi hezaran kesên kurdistanî ve hatin pêşwazîkirin. Girseyên ku komî hev bûn bi xwezayî layangiriya aştiyeke birûmet û ji hêla din ve jî biryara tekûz a serkeftinê nîşanî komara faşîst dan. Gelê me dizanibû ku bi van faşîstan re aşî nabe, ji ber ku aşî mirina xwînmijan e. Lê pêwîst bû ku gelê kurd careke din piştî du agirbestan keyseke nû bida wan. Di şexsê partiyeke şoreşger de gelê kurd bi terorîstiyê tawanbar dikirin. Dizanibûn ku êdî partî bûye gel û gel bi xwe jî bûye partî. Ew helwesta wan a

dîrokî li dijî hebûna gelê kurd bi vî hawî dihat vebirîn. Her wekî me li jorê der bir: Ev şensê dawîn dê heqî û neheqîya her du aliyên şer derxista navê. Em bi van heyetan re ber bi serbajarê Amedê ve bi rê ketin. Bûyerên ku me ji Stenbolê heya ber deriyê Amedê Siwêregê dîtin hêjayî gotareke civaknasîyê ne. Ji layê derûnî ve barûdoxa mêtîngeran karesateke nedîtî bû.

Li hemberî me kemîn danibûn û di kozikên li tenîsta riya Siwêregê de leşkerên newêrek diricifin. Ez fikirîm ku ev belengaz û rebenên neçar çawa karîbîn li hemberî gerîla şer bikin. Jixwe roj bi roj şehîdên? wan zêde dibin. Dîsan jî serbazên wan ên qure dikaribûn gul û qerenfilên aştiyê bi potînen xwe bipercîqînin. Helal be ji wan re: Hem dikujin, hem hişk dibin, hem jî ji çareseriyê direvin. Piştî ku em bi heman tade û kotekiyan vegeriyan, ji ber çavdêriyan mêvanên biyan jî mîna gelê kurd biryar girtin: Çareserîya vî şerê kirî her şer û şer e.



ENDAMA Meclîsa Partiyê ya HADEP'ê Selma Tanrikulu roja 9'ê rezberê ji hêla DGM'ya Amedê ve hate girtin. Selma Tanrikulu digel Sekreterê Giştî yê HADEP'ê M. Zeynettîn Unay, Sekreterê HADEP'ê Hüseyin Bora, rêveberên HADEP'ê M. Can Tekin, Mehmet Başkurt, Hanîfî Baran, Nurhan Etki, Şahin Eroğlu, Serokê Sendikaya Kedkarên Tenduristiye (SES) şaxa Amedê Ali Ürküt û Serokê Eğitim-Sen a Amedê Haydar Kılıçoğlu, di dema amadekariyên pêrgîniya "Trêna Aştîyê de roja 31'ê gelawêjê hatibûn binçavkirin, piştî 10 rojên di binçav de, rêveberên HADEP'ê û sendikavan derxistin dadgehê. Li wir Selma Tanrikulu hate girtin, yê din hatin berdan.



DERDORÊN aştîxwaz wê roja 27'ê rezbera 1997'an li Kölna Almanayê festîvaleke bi navê "Barış-Aştî-Frieder" li dar bixin. Kulturform Turkeî/Deutschland, Arkadaş Theater, Alternatif Toplum Merkezi, TÜDAY, El Jeth û Unterstüztz van Dialog-Kreis wekî amadekarên festîvalê têne binavkirin. Digel kes û komên hunermend wekî Şivan Perwer, Ferhat Tunç, Yavuz Bingöl, Arif Sağ, Belkıs Akkale, Lale Mansur, Halil Ergün, Nilüfer Akbal, Koma Amed û Koma Nurhak, wê siyasetmedarên wekî Akın Birdal, Andreas Buro, Cem Özdemir, Mehmet Salan, Ufuk Uras, Fettullah Erbaş, Ercan Karakaş, Şanar Yurdalapan û Tomris Özden jî wê beşdarê festîvalê bibin.

NÛÇE

Bila "Zarokên Rojê" nebin "Zarokên Kûçeyan"

Vê heftayê, wê ji nû ve zengilê dersê lê bide! Wê zarok kinc, pêlav û tiştên xwe yên nû bikin û bixin bin balîfa xwe. Jixwe tiştê ku dibistanê bi zarokan dide hezkirin jî ev e. Ji bo ku van tiştên nû nişanê hevalê xwe bidin diherin dibistanê. Lê, li "welatê rojê" "zarokên rojê" jî vê yekê bêpar in. Li şûna dengê zengilê dersê, dengê çekan tê. Êdî dengê çekan bûye lorika zarokan. Dayik jî nema bi lorikan zarokên xwe dikin xewê.

Rewşa "zarokên rojê" bi taybetî li "welatê xeribiyê" kambax û xerab e. "Zarokên rojê û agir" hêdî hêdî dibin "zarokên kûçeyan". Ji wan gelek li metropolên Tirkiyeyê bêyî hînbûna xwendin û nivîsinê li kolanan digerin. Rewşa zarokên kolana Îstîklalê ku li Taksîmê ye psikolojiya zarokên kurdistanî baş dide xuyakirin.

Zarok bêpere nepeyivîn

"Zarokên Serhildanan" di nav dijwariya jiyana metropolan de ji aliyê derûnî ve têk diçin. Remezana raborî li vê kolanê zarokêkî ji bo ku ji dezgehdaerêkî hirmiyek xwestibû, lêdan xwaribû. Bûyerên bi vî rengî gelek in. Ev zarok zivistanê di serma û seqemê de bêgore digerin û di lingê wan de şimik hene.

Ev rewş jî zû de ye bala me dikişîne. Me xwest berî vebûna dibistanê hinek



berî ku dibistan vebin me xwest em balê bikşînin ser rewşa perwerdehiya zarokên kurd. Rewşa kambax a aborî bandoreke neyînî li ser kesayetiya zarokan dike, gelekên wan bi pey nanê xwe ketine. Kesên ku mafê xwendinê bi dest xistine jî bi perwerdehiya ziman û çandêke biyan, gêj bûne. Divê gelê kurd û saziyên neteweyî xwedî li zarokên xwe derkevin.

agahiyan li ser wan berhev bikin. Pêşî agahî nedan û wêne nedan kişandin. Piştî ku me got em ji rojnameyêke kurdî tîn, hinekî hêrsa wan daket. Lê dîsa jî wêne nedan kişandin û gotin: "Bavê me wê hêrs bibe û li me bixe." Li ser israra me gotin: "Ji me re dondurme bikirin, emê biaxivin." Ku me daxwaza wan pejirand. Bi qîrîn û dilşahî wisa gotin: "Çi xweş e! Em dê li ser maseyan rûnin." Me bestenî (dondurme) kirî û em pê re axivîn. Piştî axaftina me qediya, me xwest em ji wan veqetin, îcar gotin: "Ji me re doner bikirin ku em wênayên xwe bidin kişandin." Diyar bû ku hemû tekoşîna wan a li dijî wêne kişandinê jî bo pereyan bûye. A rastir, em bi zorê jî dest zarokan filitîn.

Ev mînak bi tenê rewşa zarokên kurdên li metropolan bi şeweyekî baş berbiçav dike. Li van kolanan kesayetiya wan dihat xerakirin û bidestxistina pereyan, ketiye berî her tiştî. Ev zarokên ku ji bo besteniyê bixwin wisa dikin wê sibêroj bi hêsanî jî bo mafayê kuryekariyê bikin. Jixwe ev dever navenda mafayê ye. Digel vê, rewşa zarokan li mal jî ne baş e. Ji vegotinên wan diyar bû ku li mal gelek lêdan û kotekan dixwin.

Tevî vê rewşa nebaş, zarok hîna jî dibêjin: "Qral tazî ye". Di dema axaftinê de bi tesadûfî bavê zarokêkî jî di cem me re derbas bû. Me sedema hatina wan jê pirsî. Wî got: "Ji ber rewşa aborî" lê zarokêk hilpekiya û got: "Qoriciyan gundê me şewitandin." Li aliyê din zarokan, giliyê hin rojnamegeran kirin û jî me xwestin ku em ji wan re nebêjin "zarokên kûçeyan". Dîsa gotin, piştî ku rojnameyêk li ser wan nûçe çêkiriye, polis û zabiteyan tade û çewsandin li wan kiriyê.

Her çiqas em ji bo rewşa wan a dibistanê çûbûn cem wan jî, lê gava ku me qala dibistanê kir, mûyên serê wan gijbûn, pirsên me bêbersiv hiştin. Hemû-



yan yekcar gotin: "Em ji dibistanê heznakin." Ji wan gelekên jî dev ji dibistanê berdane.

Li Kurdistanê perwerdehî

Digel rewşa metropolên Tirkiyeyê, li Kurdistanê jî rewşa zarokên kurd "karesateke çandî" ye. Tê ragihandin ku li Amedê jî zarokan %53 li kolanan birçî û tazî digerin. Tevî perwerdehiya bi zimanê biyan, mamostayên ku tayînî Kurdistanê dibin bi piranî naçin. Bi pey ragihandina Mefahir Altındağ ku yek ji berpirsên Eğitim-Sen'a Amedê ye, li Kurdistanê hejmara dibistanên girtî nêzikî 3 hezaran e û pêdiviyên dibistanan ên bingehîn nayên peyda kirin. Dîsa Mefahir Altındağ da zanîn ku ji zarokan gelek nexwazin herin dibistanê û jixwe dibistan ji bo wan tiştêkî lûks e. Zarokên ku diçin dibistanê jî ji ber ku di navbera du zimanan de mane, zêde ne serketî ne. Altındağ jî bo standina şabaşê qeydkirîne (kayıt bağışi) jî diyar kir ku digel giştîname ya wezaretê perwerdehiyê jî malbatan pere tê standin. Altındağ li ser xebatê wan jî wiha axivî: "Em gelekî


zehmetê dikşînin. Ji ber girtin û binçavkirinê em nikarin peywirên (wezîfe) xwe yên rastîn bi cih binin."

Ji bo ku mirov encama ne-mirovî ya sîstema perwerdehiyê ya dewleta tirk ji nêzik ve bibîne, divê pêşîn mirov li kesayetî û psikolojiya zarokên kurd binêre. Ji ber ku perwerdehiya bi zimanê biyan kesayetiya zarokan dipelişîne û mirovên jixwenebawer tîne pê. Ev perwerdehî daxwaza hînbûnê ya zarokan dike û zarokên herî jîr û jêhatî jî dixê dewsa gêj û debengan. Wekî ku serokê Kurd-Kav'ê Yılmaz Çamlıbel jî bo rojnameya me dabû zanîn, zimanê biyanî wekî virûsên ku dikeve hafizeya kompüterê ye, dema dikeve serê zarokan, wan gejk dike. Lê diyar e ku dewleta tirk naxwaze dev ji vê "tevkujîya çandî" berde. Di ser de jî dixwazin li Kurdistanê hejmara "navendên pişafînê (yatılı okul)" zêdetir bikin. Divê kurd van gotinên Paulo Freire qet ji bîr nekin: "Bi zimanê mêtîngeran tu nûjenî û pêşketin nayê pêkanîn."

MAZLUM DOĞAN

PEN'a Navneteweyî û PEN'a Kurd

PEN, Komeleya Nivîskarên Cîhanê ye. Ew di sala 1921'ê de hate avakirin. Nivîskarê ku bibe endamê PEN'ê li ser xwe dike bar, ku ewê di ber mafên mirovan de xebatê bike. Her nivîskarekî ku bixwaze bibe endam, divê berî wê daxuyaniya PEN'a Navneteweyî, ango PEN Charta destnîşan bike



Di Kongreya 64'an a PEN'a Navneteweyî de, nûnerên PEN'a Kurd bi axaftinekê rewşa kesên ku ji ber bîr û baweriyên xwe hatine girtin, bi taybetî jî a İsmail Beşikçi û Ünsal Öztürk anîn zimên. Vê axaftinê piştgiriyeke mezin ji endamên kongreyê girt.

Her sê tîpên ku PEN bi wan tê binavkirin, kurtiya sê peyvên îngilîzî ne. Tîpa P. ji dêla poets (helbestanvan), tîpa E. ji dêla essayists (gotarnivîs) û tîpa N. ji dêla novelists (kurtebêjok) hatine danîn. Essay peyveke îngilîzî ye, xwebêja wê bi kurmancî "danexwe" û bi soranî "hewldan" e. Di "essay"ê de yê nivîskar dide xwe, ango hewl dide xwe ku bi kurtî li ser mijareke zanistî, çandî yan rêzanî, ango siyasî binivîse, bê ku ew bi tu qeyd û bendên nivîsarî ve girêdayî be, belê ev nivîsa wî gerek e, tijî raman be.

"Novelle" jî di binyata xwe de peyveke latînî ye, ketiye zimanên germanî û romanî. Peyva "latînî" bi xwe "novûs" e, û xwebêja wê bi kurmancî "nû", ango "taze" û "ecer" e.

Ji dema nû vejîne vê, ango ji dema renaîsansê ve peyva "novellê" jî "kurtebêjokê" re tê bikaranîn.

"Kurtebêjok" jî çîrokeke kin e, mijara wê bûyereke ku bi rastî bûye yan jî bûyereke ku kare bibe ye. Bûyera mijarê divê tiştê ku nû be, ku her kes, gava wê bixwîne, pê bibehte. Di mijarê de ji

bilî yek "dijberiyê" çênabe tu dijberiyên din hebin.

PEN Komeleya Nivîskarên Cîhanê ye. Ew di sala 1921'ê de hate avakirin. Nivîskarê ku bibe endamê PEN'ê li ser xwe dike bar, ku ewê di ber mafên mirovan de xebatê bike. Her nivîskarekî ku bixwaze bibe endam, divê berî wê daxuyaniya PEN'a Navneteweyî, ango PEN Charta destnîşan bike

Di nav PEN'a navneteweyî de çar komîte xebatê dikin. Ew jî ev in:

- 1- Komîteya ji bo Nivîskarên di Zindanan de.
- 2-Komîteya Nivîskarên ji bo Aştiyê
- 3-Komîteya Jinên Nivîskar
- 4-Komîteya ji bo Mafên Wergerandin û Zimanzaniyê

Dîroka PEN'a Kurd

Navenda PEN'a Kurd jî di 29.06.1990'î de di pêşengiya birêz Hüseyin Erdem de hate avakirin. Heta ku birêz H. Erdem serokê PEN'a Kurd bû, xebateke navneteweyî gelek giranbûha hate kirin. Belê mixabin ew bi nexwe-

şiyeke giran ket û hew dikarî bi vî barê giran rabe. Bi nexweşiya birêz H. Erdem re nexweşiyê mezin giha PEN'a Kurd jî. Di dema piştî wê re PEN'a Kurd gelekî lawaz û qels bû. Ji ber ku PEN'a Kurd hew dikarî bi kar û barê xwe rabe, PEN'a navneteweyî di rezbera 1996'an de, di kongreya xwe ya 63'an de li Guadaluajara/Meksîko xebata PEN'a Kurd rawestand.

Di 1.2.1997'an de li Berlinê kongreyê geştî ji rexê hemû endamên nivîskarên PEN'a Kurd ve hate lidarxistin. Di kongreyê de li ser rewşa rêxistinî û riyên xebata navneteweyî hate axaftin. Komîteyê serokatiyê ya nû hate hilbijartin û biryar hatin girtin ku komîteyê serokatiyê ya nû wê dest bi xebata xwe bike û wê toza ku hatibû serê, ji ser xwe dawêşîne.

PEN'a Kurd di bin serokatiya nû de vejîya

Ji roja hilbijartina serokatiya nû ye ew ketiye xebatekê bê westan, ji bona ku PEN'a Kurd careke dî vegere nav-

malbata navneteweyî û bikaribe li ser tanga navneteweyî bi berpirsiyarên xwe rabe.

Bi ser ku hineke nedilxwaz li dijî serokatiya nû derketin û xwestin niqekê bixine sukra wê, ku ew bi partiyeke Kurdistanê ve girêdayî ye û ji ber wê yekê gelek kevîr avêtin û ji dadgeha almanî û serokatiya PEN'a Navneteweyî re nameyên bêbextî şandin, serokatiya nû gavên mezin bi pêş ve avêtin û karibû jî her rexekî re bide çespendin ku ew komeleyê serbixwe ye û bi tu awayî naxwaze bikeve bin destê partiyeke siyasî. Piştî têkiliyê xurt bi serokatiya PEN'a Navneteweyî re û bi dadgeha almanî re serokatiya nû karibû xwe bide pejirandin û bibe cihê baweriyê hemûyan.

Wekî sekreterê geştî yê PEN'a Kurd ez di wê baweriyê kûr de me, ku ev komeleya kurdî, dezgeheke neteweyî ye û nabe ku bikeve bin baskê tu partiyên Kurdistanê. Ev yek nayê wê wateyê ku Navenda PEN'a Kurd nabe bi dezgehên din Kurdistanê re xebatê bike, piştgiriyeke bide wan û ji wan bistîne.

Bi dîtina me divê Navenda PEN'a Kurd di vî warî de her tim yek armancê li ber çavê xwe bihêle, ew jî ew e ku ew dezgeha ha bibe meydana ku hemû nivîskarên kurd li ser li hev bicivin, bîr û baweriyên xwe bi hev biguherin, ji bo pêşveçûn û parastina ziman û çanda neteweya kurd bixebitin bi hêviya nêzî-hevbûneke neteweyî li ser tanga Kurdistanê, danasîna çanda kurdî û ji hev fêmkirin rastî di nav gelên cîhanê de, li ser tanga navneteweyî.

Her wekî ku me li pêş jî da xuyakirin, piştî peywendiyê bê westan bi serokatiya PEN'a Navnetewî û sekretêrê wê yî giştî, birêz Alexander Blokh re, wan jî em bi nivîsîn vexwendin kongreya 64'an ya PEN'a Navneteweyî ya ku li bajarê Edinbûrgha Skotlandê pêk dihat.

PEN'a Navneteweyî kurd berhembêz kirin

Ev kongre di rojên navbera 5 û 11'ê gelawêja 1997'an de hate girêdan. Cihê kongreyê New Parlements Haus, anga avahiya parlamentoya nû ya Skotlandê bû.

Şandî, anga nûnerên 91 neteweyî hatibûn. Hinekan şandiyek û hinekan gelek şandî şandibûn. Em kurd du kes jî navenda PEN'a Kurd amade bûn.

Piştî saetekê ji gihîştina me em yekser çûn û me çavpêketinek bi Sekretêrê Giştî yê PEN'a Navneteweyî, birêz Alexander Blokh re kir. Wî bi dilşahi

bixêrhatina me kir û got, ku ew piştgiriya daxwazên gelê kurd dike û gelek dilşah e ku PEN'a Kurd dîsa vegekiye nav malbata PEN'a Navneteweyî.

Piştî wê em li civîna Komîteya ji bo Nivîskarên di Zindanan de amade bûn û me li wê derê rewşa nivîskarên kurd anî ber çavê amedekaran.

Em di hemû komcivînên giştî de amade bûn. Di civînên giştî de nêzîkî 300 nivîskarî ji hemû rexên dinyayê amade bûn. Du caran serokê PEN'a Navneteweyî rê da me ku em li ser rewşa gelê Kurdistanê biaxivin. Di bin

Me çar bangewazî li ser rewşa Dr. Îsmail Beşikçi, Ünsal Öztürk, li ser rewşa kuştin, girtin û revandina nivîskaran bi giştî û li ser nebûna azadiya rojnamegeriyê li Tirkîyeyê û daxuyaniyê rojnameyî bi zimanê îngilîzî li ser hemû endamên kongreyê dest bi dest belav kirin:

dengê bilind yê çepikên amedekaran de biryar hate standin ku sarkirin ji ser Navenda PEN'a Kurd rabe û ew jî nû ve vegere nav malbata navneteweyî.

Me çar bangewazî li ser rewşa Dr. Îsmail Beşikçi, Ünsal Öztürk, li ser rewşa kuştin, girtin û revandina nivîskaran bi giştî û li ser nebûna azadiya rojnamegeriyê li Tirkîyeyê û daxuyaniyê rojnameyî bi zimanê îngilîzî li ser hemû endamên kongreyê dest bi dest belav kirin.

Me destnîşanên çend nivîskarên bi nav û deng ji bo piştgiriya Trêna Aştiyê dane hev û ji berpirsiyarê ve xebatê re şandin.

Me hevpeyvînek bi rojnameya skotlandî ya herî mezin, The Herald re kir. Di nav 91 navendên PEN'ên din de, der barê Kongreya PEN'a Navneteweyî de ve rojnemayê li ser PEN'a me û rewşa gelê Kurdistanê nivîsî.

Li tenişt kar û barên kongreyê, me karibû hevpeyvînan bi navendên van PEN'an re jî bikin: Swêd, Norwec, Finlandiya, Danîmarka, Amerika, Kanada,

Kataloniya, Tirkîye, Almanya-Rojava, Almanya-Rojhilat, Kîbrîs, Amerîkaya Rojava, Nepal, Îran, Swîsre û Tatarîstan.

Me hevpeyvînek bi şandiyê UNESCO re kir. Me jê pirsî ka mirov çawa dikare şerê nexwendewariyê li Kurdistanê bike.

Me hevpeyvîneke taybetî bi serokê nû yê PEN'a Navneteweyî Homero Aridjis re kir.

Der barê Kurdistan û Tirkîyeyê de ev biryarên han ji rexê endamên Kongreya Giştî ya 64'an ya PEN'a navneteweyî ve hatin pejrandin:

1- Rakirina biryara sarkirina têkiliyan bi PEN'a Kurd re.

2- Biryarek der barê bindestkirina baweriyaya azad li Tirkîyeyê ji rexê navenda PEN'a Finlandayê ve hate pêşniyarkirin û bi giştî jî rexê hemû endamên kongreyê ve hate pejrandin.

3- Biryarek ji rexê navenda PEN'a Amerika-Rojava ve, bi piştgiriya navendên PEN'ên Danîmarka, Îngilistan û Kanadayê li ser rewşa Aysenur Zarakulu û nivîskar û rojnamevanan li Tirkîyeyê hate pêşniyarkirin û bi giştî wekî biryar hate wergirtin.

Bi dîtina min vegekirina PEN'a Kurda nav malbata PEN'a Navneteweyî serketineke gelekî mezin e. Ji ber ku ev rêxistina kurdî neteweyî, rêxistina yekemîn e ku li ser tanga navneteweyî beşdar dibe. Ez di wê baweriyê de me, ku gava mirov ve rêxistinê bi rêxistina Yekîtiya Neteweyên Cîhanê bi UNO re berawer bike, mirov dibîne ku PEN bêhtir ji UNO kare li ser navê neteweyên cîhanê biaxive. Rast e, bi nav UNO Yekîtiya Neteweyên Cîhanê ye, lê ew ne nûneriya neteweyan, ya dewletan dike. Ji ber vê yekê ez dibêjim ku vegekirina PEN'a Kurd nav xebata navneteweyî ji kurdan re karekî gelekî mezin e.

DR. ZERDEŞT HACO

Kurd li Amedê di kemîna aştiyê de bûn

OSMAN ÖZÇELİK



Trêna Aştiyê ya bi navê Apê Mûsa wê di 26'ê Tebaxê de, ji "Brûxel Midi" ya Belçîka rabûya ku were Amedê. Belê hêza aştiwazan "Banga Hannover" ne bi qasî ya wezîrê karê derve yê Almanya bû. Trêna ranebû.

Romanya û Bulgarîstanê jî şekala xwe avêtin nav sola xelkê û gotin: "Em jî nahêlin Trêna Aştiyê di welatê me re derbas bibe." Xwelî li serin! Tew, ew jî bûn dewlet û nahêlin Trêna Aştiyê li ser erdê wan bimeşe.

Li Amedê bavê şehîdekî digot: "Em dizanin berjewendiyê Almanya û Tirkîyeyê bi hevdû re ne. Almanya ji tanq û topan heta prezervatîf û paçên jinan ê rojên taybetî difroşin Tirkîyeyê. Almanya, ji bo şîmendiferêkê ve bazarê jî dest xwe bernade. Lê lawo bulgar tu doza çi dikî?"

Di têkiliyên navneteweyî de rûmeta van her du dewletan bi qasî qanîkek benîşt jî nemaye. Ji ber ku ew, dikarin ji bo mistek dolar her hêjahiyên mirovî binling bikin.

Komara Tirkîyeyê, bi qedexekirina Trêna

Aştiyê bi nexistina otobûsên aştiwazan ya Amedê, bi binçavkirin, lêdan, bi fort û zirtan li ber çavê dinyayê kêmket.

Sed û heftê aştiwazên ewrûpî ku di nava wan de parlamenter û rêveberên sazûmanên sîvil jî hebûn, îro ew li hemû Ewropa û li cîhanê belav bûne û li dijî Tirkîyeyê propagandeyê bi tesîr dimeşînin. Îngilistanê di cih de nerazîbûna xwe anî ziman.

Armanca çalakiya Trêna Aştiyê an karwanê aştiyê balkêşana raya giştî bû ku bê zanîn li welatê me çî dibe, çî nabe. Dihata xwestin ku dinya alem bi vî şerê qirêj bihesê û riya aştiyê vebe. Bi rastî di vê çalakiyê de careke din jî rûyê dewleta hov derket holê. Aştiwazên biyanî digotin: "Her çiqas me tiştînin zanibûn jî, em îtiraf dikin ku heta me "ço" yê dewletên nexwara, me yê nizanibûya çî tê serê kurdan.

Heta îro helwesta dewletê ya li hemberî çalakiyê, liv, lebat, kirin û hewldanên me alîkariyê mezin bi me re dikir. Heke çalakiyê me pûanek dixist kîsê me, helwesta dewletê ya li hemberî çalakiya me ew qasî şaş bû ku me bêhtir pûan kar dikirin.

Wan çî digotin?

Digotin: Me piştî şervanên kurd şikandiyê û şer-mer nemaye. Ya diduyan digotin: Bi navê pirsgirêka kurd-murd tu problem tune. Problem terorîzm e û em li hemberî terorîzmê tedbîran digirin. Ya sisiyan jî dig-

otin; li Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Tirkîyeyê problema şûndemayîna aborî û civakî heye. Ger em reforma axê û ya perwerdekirinê pêk bînin tu pîrs-mîrs namîne.

Amediyan ji me re gotin emê bi sedhezaran beşdarî civîna aştiyê bûbûna. Bi rastî jî wilo bû. Me bi çavên serê xwe dît. Ji Mersîn, Edene, Entabê bi sedan otobûsên aştiwazan bi rê ketibûn. Belê hatibûn rawestandin. Berî çalakiyê bi sê rojan bajarên kurdan ketibû bin kontroleke mezin ku tu kes ji wir neçin Amedê.

Li Amedê qada civînê bi leşker û polîsan hatibû dagirtin û her kûçeyên der û dora qada civînê bi panzêran hatibû xetimandin. Dîsa jî xanî, mal û baxçeyên der û dora qada civînê bi însanan ve mişt tîjî bûbû. Her maleke Amedê ji aştiwazên kurd re bûbû kozîkek. Di her malekê de 30-40 kes bi nan û av hatine ezimandin. Bi vî awayî bi dehhezaran kurd li Amedê ketîne kemîna aştiyê ku bi îşaretekê qada civînê, zîkak, kûçe û kolanan tîjî bikin.

Dewletê dît ku wê bi sedhezaran mirov li Amedê bicivin û wê doza aştiyê bikin. Û wan dîtibûn li Elîgora Sirûcê kurdan bi çî awayî çembera leşker û polîsan di bin gulebaranê de qetandine û mîna kevokên aştiyê di nav zeviyan de bezîyane û xwe gihandine karwanê aştiyê. Ji bo vê bû ku dewletê her tişt da ber çavê xwe, aştiyê qedexa kir.

Çşoreşger Çeto Çetin Sonkurt

Wexto mardim, jewerîya embazîn keno û pey ra ey keno vinî, zaf kewno ci ver. Ek no mardim heskerde yo û rûmet dayo embazanê xo, o wext xeylê zerya kesî veşneno. Nê embazî zaf vêşî çî xo pey de verdanê, kes nêşeno vîrameyina înan ra xo abirno. Înan ra jew jî, embaz Çetin Sonkurt bi. Çetînî rê ma vatê Çeto, la belê namê ci yo şoreşgerî jî, Elî Îhsan bi. Çeto şaristana Sêwreg ra, dewa Ares re bi. Çetoy lîsey dima dewa Qereqoyinî de mûsnakarîn (mamostatî) kerd bi. Coka jî qeç û qûlê na dew hemin jî o silasnayê. Ey xo jî dewa, Qereqoyinî ra zaf hes kerdê. Ez vana şarê na dew jî, ey ra hes kerdê.

Sera 1991 de ez şîbiya Sêwreg, hindê hîrê mangan wija de mend biya. Ê rojan de şerê (cengê) korfezî newe vejya bi. Heme ca de korfez bibi mesela jewinî. Kesê jî meselanê netewê ma sero nêvinderdê. Ma se kerdê nêkerdê jî nêşayê rojewê şarî (watanê şarî) biqelibnê û wastenanê xo biyarê zıwan. Ma wendoxî xo bi xo mendê û şiyê parqê uçgenî de tewla kay kerdê. Jû jû fin jî ma embazana piya şiyê rezan miyan de hingûr werdê. Rewşê ma qe rind nêbi. Ê rojan de embaz Çetoy rewşê ma wendoxan wina ardê zıwan: "Wax marê ke, ma jî xo ra vanê ma şoreşker ê. Bi no hala ma yê veyşan bimanê. Ek rewş wina şiro, na sûk ra mayê rew biremê." La belê vîr û baweriyê Çetoy zaf çetin bi. Çiyê jî nêşayê o xo ra biterasnayê. Loma embaz Çeto, fitneyina dewijan miyan de bibi gird.

Ey vatê: "Dewij û lû zaf pê manenê, hurdna jî rew mardiman xapeynenê. Ek no dewij Sêwreg ra wo tewrî kesî xapênenê. Ey ra jî, gerek ma zaf aqildê xo ser bê."


Rojê fina ma parq de ronîştbiyê. Jew embaz ame û ma rê wina vat: "Riha de şoreşgeran rîpelê rêzê naman visto xo dest. Ciwano ke namê ci rîpel do, şinê Riha û namanê xo rîpel ra rejnenê ke çiyê nêro ci sere." A ser hezarana ciwanî biyê tewrdê şerê (cengê) reyayinî. Dewleta Romî na rewş ra zaf tersayê. Cok ra dewletî jî, rojnaman de û televîzyonan de winî xeberî vîla kerdê: "Ma wazenê herema OHAL ra 70 hezar kadro bigîrê. Êk ciwaniyê û wazenê bixeftiyê wa dewlet ra kar biwazê." Dewlet na zexeleya xo ya waştê ke ciwananê ma bixapeynê. Raştî jî ciwanan qandê karê dewlet, kewtî bî rêz. La belê înan nêzanayê ke dewleta romî îna xapeynena.

Na xeber zey Xizirî resê wendoxan.

Xebera weş şarî miyan de rew bibî vila. Şarî xo miyan de wina vatê: "Wili bîli destê nê şoreşgeran, reseno heme ca. Çiyê jî înan dest ra nêreyeno." Ma wendoxan jî pê ra pers kerdê, la belê kesî jî çiyê nêzanayê. Çend rojî tepya mi Çeto dî û mi na xeber ci ra pers kerd. Ey o roj min rê wina vat: "Embaz kesî rê çiyê mevaj, na xeber min ra vejyê. Min ewna ke, ciwanê pêro wazenê dewlet rê bibê kadro. Min bi xo jî nêşayê silasnayanê xo na ray ra açarnî (ageyrani). Coka jî, min xo rê vat se krî, se nêkrî. Wili finê ra fitneyê dewijan ame aqildê min û ez şiya qahwe û jew mardimî rê wina vat: "Embaz ti kesî rê mevaj, goreyê vatenan şoreşgeran rîpelê rêzê naman visto xo dest. Ek birayê to jî dewlet ra kar waşt, wa xo bipawo. Bewn ma mardimê pê yê coka ezo to rê vana, la belê ti kesî ra mevaj. Ey jewerî ra, ê bînî jewerî ra û ê bînî jî jewerî ra vat û winî winî na xeber şarî miyan de bî vila. Di rojî raverd, nêraverd bi ke jew mardimî jî amê xeber da min. No kar wino yo embaz." Çetoyî senî ke min rê vat, ez winî wiyawa ke ezo ê rojî qe xo vîra nêkena.

Embaz Çeto zaf viraşte bi. Wexto ke zankeyî (üniverste) abiyayê, ma ageyray Stanbol. Stanbol de jî ma pê sero şiyê û ameyê. Çetoy Zankeyê Stanbolî de fakûlta Hûqûqî de wendê. A ser Stanbol de kotî de çiyê biyê, Çeto wija de xo kerdê hadre.


O zaf çapik bi. Zey mojleyan (karınca) xeftiyayê û zaf zerî dayê embazanê xo. Embaz Çetoy zankey nîmjet verada û şî koyan ser û bi gerîla. Xeylê wext min ey ra xeber nêgirot.



Bahdo ez pey hesyawa ke ameyo Sêwreg. No fin Çeto bibi fermanarê gerîla û winî amebi Sêwreg. A ser jî gerîlayê reyayinê şarê Kurdistanî adirbirnayin de bî. Adirbirnayin sera 1993'de gerîlayê şoreşî vêşî nêşiyê leşkerê romî ser, la belê xo pawitê. La belê dewleta romî çend ke ci dest ra ameyê, leşkerê xo riştê gerîlan ser. Dezayê mi, birayê min o delal fermanar Elî Îhsan û şoreşger Çeto, Aliya Aqil û Burhan Gulerî ya piya şaristana Sêwreg de, dewa Qerekoyin de şehîd kewtî. Malbata Çetoy, meytê ci berd dewa Ares û herda sûr de teprit (da herda sûr).

*Werzi daylanê ma werz.
Romî de bext çî geyreno
ke, rûmet bido adirbirnayin.*

ZÜLKÜF KIŞANAK



- 13.09.1927: Êrîşa Komara Tirk li dijî "Serhildana Agriyê dest pê kir.
- 14.09.1929: Dewleta tirk, li herêma çiyayên Tendûrekê tevkujiyeke mezin pêk anî.
- 14.09.1985: Helbestvan Hîşyar, çû ser dilovaniya xwe.
- 15.09.1993: Meleyê welatparêz Talip Yûce li Mêrsînê ji hêla kontrayan ve hate şehîdkirin.
- 15.09.1982: Akif Yilmaz li Zîhdana Amedê di rojîya mirinê de gihîştê şehadetê.
- 16.09.1993: Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya hate girtin.
- 17.09.1982: Ali Çiçek li Zîhdana Amedê di rojîya mirinê de şehîd ket.

- 17.09.1992: Sekreterê Giştî yê PDK-î Dr. Seîd Şerefkendî û du hevalên wî, ji hêla rejîma Îranê ve, li Parîsa Fransayê hatin şehîdkirin.
- 18.09.1948: Sazûmankarê Pakistanê Mihemed Alî Cînnah çû ser dilovaniya xwe.
- 18.09.1996: Navenda Wartoyê ji hêla dewleta tirk ve hate gulebaran-kirin.
- 19.09.1908: Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurd (Cemiyeta Terakkî û Teawûna Kurd hate damezirandin.
- 19.09.1913: Kovara Yekbûn dest bi weşanê kir.

AWIR

Di mîzaha kurdî de tîpeke taybet: Gurî



Roja 6'ê rezbera 1997'an li NÇM'ya Stenbolê listikek bi navê Gurî ji aliyê şanogerên NÇM'ya İzmirê Şanoya Hêvî ve hate pêşkêşkirin. Listik ji aliyê xebatkarê NÇM'ê Gafur Doğan ve hatiye nivîsîn. Gafur tîpeki gelêrî girtiye û li gorî rewş û merca îroyîn ji nû ve jîndar kiriye.

Di listikê de bi taybetî bi serxwevê hatina Gurî gelekî bi hostey hatiye lihevanîn. Listik bandora kapitalizmê ya li ser gelê kurd jî bi şeweyekî sergirtî li ber çavan radixe.

Wekî me di destpêkê de jî da xuyakirin, Gurî di civaka kurd de, şexsiyeteke dinimîne. Ev şexsiyet bi konekî û qurnaziya xwe navdar e. Ji ber gurîbûna xwe nikare di nava civakê û civatê de cihêkî birûmet bigire, tim dibe mijara henek û pêkenokan, lewre jî, bi kirinên xwe heyf û tola xwe ji mirovan distîne. Kîna xwe ya bi salan ji dizîya tiştên gel, hetanî jêkirina rihên kalên kurdan ku ew ji bo kalên kurdan wekî namûsê biqêdr e, ji aliyê Gurî ve tê kirin. Gurî tu tiştî jî bîr nake, li mala pîrê têr dixwe, piştî ku xwarinê dixwe mala pîrê pis dike. Ji ber ku pîrê gotinên nebaş ji bo Gurî gotine. Ev yek jî kîna Gurî ya mayîna li dervayî gel bi awayekî zelal diyar dike.

Di vê listikê de, piştî ku Gurî bi serhildana Şêx Seîd û daliqandina wî dihesê, diguhere. Ev guherîn jî dibe nîşana hişyarbûna Gurî û yên wekî wî.

Gelên dinyayê di dîroka xwe de ji nav xwe gelek qehreman afirandine. Ew bûne simbol û nîşanên wî gelî. Di listika Gurî de jî qehremanek hatiye afirandin. Ew qehreman jî guriyê kurdan e.


Bo nimûne nivîskarê listikê Gafur Doğan jiyana keloğlanê tirkan dişibîne jiyana guriyê kurdan û diyar dike ku Keloğlan jî ji aliyê gelê tirk ve nehatîye hez kirin. Her wiha guriyê kurdan jî vî alî ve dişibe keloğlanê tirkan, lê taybetiyên ku wan ji hev vediqetînin jî hene. Her wekî çawa gelên din jiyana tîpên xwe yên gelêrî listik û film amade kirine, gelê kurd jî roj bi roj di vî warî de berhevan dide. Wekî tê zanîn berî niha jî Şanoya Hêvî tîpê Kosegelî kiribû şano û ew listik jî ji aliyê gel ve gelekî hatibû ecibandin.

Belê, şanogeriya kurdî li bakurê Kurdistanê gelekî nû ye. Lê wexta ku mirov li hin berhevan temaşe dike, dibîne ku di vî warî de gelek gav hatine avêtin.

AZAD AVAŞÎN

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÛĞÎT



Qewîtiya Apê Mûsa

Sal 1968 e. Meh hezîran (pûşper) e. Ji bo imtihanên unîwersîteyê ez hatime Stenbolê. Ez li cem mala Apê Mûsa dimînim; Wê mala navdar li Suadiyê mîna otelêkê bû ji bo kurdan ji her aliyê welêt, nêzikî du hefteyan ez li vê malê mam. Di vê navê de me min gelek şexsiyet û xwendeyên kurd nas kirin ku îro jî di nav rêzên xebatê de ne. Wek nimûne Serokê parlamentoya Kurdistanê li Dervayî Welat (PKDW) bîrêz Yaşar Kaya û hevala wî Yurda Kaya. Ez ne şaş bim wê salê zewicî bûn.

Bi rastî jî mîna ku berdeyam tê gotin, çûn û hatina mala Apê Mûsa zêde û zindû bû. Te digot qey balyozxaneya kurdan e xaniyê li Suadiyê. Qeflek diçû û refek dihat. Sohbetên li vir gur bûn, siyasî û kulturî bûn. Li ser rewş û pergala kurdan, Turkiyê û cîhanê bûn. Êvara roja ku ez dê vegerim, derengê şevê piştî ku mêvanên Apê Mûsa belav bûn, xwendevanên zanîngehan vegeyriyan mal û qonaxên xwe, gote min: "Lawo tu dê sibehê vegeerî Nisêbînê. Ez dê wezîfeyekê bidim te. Li Nisêbînê Kermoyê Mitirb heye. Ku tu vegeyriya, teqez divê tu herî mala wî. Straneke wî heye. Wî bi xwe çêkiriye. Têra xwe xweser û bikêr e. Li ser axe û malmezînan herêma Mêrdînê ye. Ew di vê strana xwe de semyan û maqûlên navçeyê rexne dike. Bi şarezayî û hostetiyê hêjayî pesnê taybetmendî û xisletên her kes nizane, nabîne, dibîne û nikare îfade bike, tap kirine. Tu çi dikî bike Kermo bibîne. Strana wî binivîsîne û bi awayekî bigihîne min. Ji bîra neke ew ne bi tenê stranek e. Analîzek e, lêkolîneke sosyolojîk e. Kurte-dîrokeke deshelatdar û bavikên li dora Mêrdînê ye. Rewşa Kermo ne baş e. Mîna ya giş hunermend û dengbêjên me yên din e. Temenê wî jî baş mezin e. Çi dibe çi nabe. Tiştêk bi Kermo bê, ev stran jî wê pê re bixesire. Heyf e. Xebînet û mixabin e. Gotina ku nebûye nivîsandin mîna hêka qitîkê li rastê ye. Çu deman gerantiyê wê tune...."

Kermo, min nas dikir. Salê çend caran dihate cem me gund û li odê distirand. Çend diranên wî ketibûn. Zîkek têr û çendek birçibûn. Dengê wî ne ew çendî xweş bû. Belê xwedî stîl û dengê xwe bû. Di nav stranên wî de strana "Li Van Roviyan" ya helî navdar bû. Ev bû strana ku Apê Musa dixwest. Kermo bi eslê xwe jî aliyê Êstîlê dihat. Du-sê sal bûn mala xwe barkiribû Nisêbînê.

Pêwîst nake ez bêjim ez çendî dilşa û kêfxweşbûm ku Apê Mûsa wezîfeyê wiha da min. Çawa ez giham Nisêbînê, ez peya bûm, min li nav û navnîşanên Kermoyê Mitirb pirsîn. Min mala wî tap kir. Li taxa Qijlê bû. Ji kelpîçan ode û salonêk bû. Xezanî ji her aliyê wî dirijîya. Ew û jina xwe bi tenê bûn. Gava ez ketim hundir li ser merşêke kevnar pala xwe dabû balgîhekê. Di destên wî de tîzbiyêke dirêj ji yên sedûyek libî hebû. Min silav lê kir û seba serdana xwe jê re got. Kermo daxwaza min red kir. Min kir û nekîr tiştêk nexist destê min, tu nabê tobe kiriye. Ribab avêtîye û sonda asê xwariye ku careke din nestire û li ribabê nexê. Beriva Kermo ez gelekî xemgîn kirim, dilê min pir êşand. Min qewîtiya Apê Mûsa neanibû cih. Ev yek di dilê min de mîna kulekê ma. Bi salan min ji bîra nekîr. Sala 1992'yan ku ez ji bo rojnameya Welat çend mehan li Stenbolê mam û min derfet dît, bêje hema her hefteya ku ez Apê Mûsa ziyaret bikim, ev meseleya Kermoyê Mitirb dianî bîra min û digot: "Devo, ku tu wê rojê Apoyî bûya te dê bêşik wezîfa min dabû te, bianiya cih." Piştê lê zêde dikir: "Lê çi heyf e ku wî zemanî hê Apoyî derneketibûn."

Di van rojan de ku em ketine meha şhadeta Apê Mûsa û sefera aşîxwaz bi navê Mûsa Anter gelê me li welat careke din rakire ser piyan, em Apê hêja bi rêzdarî bi bîr tînin.

Aştîyê Çep



Di nav çepera le
dehê sibehê li Birec
kes di nav çepera
Çawa ku em gihîştin
zarokan, jinan, pîr
mirov nikare binivîsê
de dengê ciwanan
strana "Berxwedana
stranê bi ser xwe
jî, jî wê

Ev gurmê gurm û hengame, deng û qîrîna aştiyê ye. Li qada Salîpazarîya Kadîkoyê, ji bo ku heyeta aştiyê bi rê bikin, bi hezaran mirov gihîştine hev. Bi awazeke ahengî dilên xwe ji bo aştiyê vekirine. Kevokên aştiyê bi çoşeke mezin firandin asîmanan. Ji fira kevokan jî xuyabû ku wê rêwîtiya me tijî dijwarî û astengî be. Digel xeyal û çoşa ji bo gihîştina Kurdistanê, pîrsekê di nava dil û mêjiyê rêwîyan de çarmêrkî rûniştibû: "Gelo wê dewlet çi bike?", "Helwesta dewleta tirk li hemberî wê hewlê wê çawa be?" Bi rastî pîrsên bi vî rengî, li ser zimanê herkesî bûn.

Tevî firandîna kevokên spî, rûyên reş li dijî aştiyê, xwe eşkere kirin. Bi rêketina karwana aştiyê re, kundên reş ên ji hesin jî, ji bo armanceke xerab bilind bûn, di ser me re diçûn û dihatin. Diyar bû ku, wê ev ewrên reş, hetanî Amedê (Heger ku em herin) hevaltîyê bi me re bikin.

Belê, fiilmekî tijî serûven û serpehatî dest pê dikir. Li Boluyê cara yekemîn, pêşiya heyeta aştiyê hate girtin. Wekî formalîte nasnameyên her kesî ten kontrol kirin. Armanç, derengxistina çûna Amedê ye.

Li gorî senaryoyê hêzên dewletê,

hinek terorîst ji bo ku aştiyê bînin hatine Tirkiyeyê, ew jî li wan terorîstan digerin.

Lê terorîstên ku malik li Tirkiyeyê xerab kirine xelas bûne, yên ku mane jî hatine li van erebeyan siwar bûne! Belê ji ber vê yekê di qîşandîna film de amatori zêde diyar bû.

Li gorî projeya amadekarên çalakiyê, wê li Enqere, Dîlok û Ruhayê gel bihata pêrgîniya Heyeta Aştîyê. Dewletê jî li gorî vê projeyê senaryoya xwe amade kiribû, gel li ku biciviya diviyabû bihata belavkirin. Mixabin ev yek li Enqereyê pêk hat. Aştîxwazên ku ji bo pêşwazîkirina heyetê li Gölbaşîya Enqereyê civiya bûn ji hêla tîmên taybet û polîsan ve hatin belavkirin.

Digel hemû tiştan gel pêşwazîkirin xistibû mejiyê xwe û bi saetan li hêviya heyetê ma. Saet dehê êvarî nezikî 600 kesî em pêşwazî kirin. Li vir daxwaza aştiwazan bi ser ya hêzên dewletê ketibû.

Pêşî çûyî pankarta aştiyê kirin

Piştî Enqereyê li gorî projeya Aştîyê wê gel bihata pêrgîniya heyetê. Serê sibehê di riya Dîlokê de me tîmên taybet li pêşberî xwe dîtin.

Ji awirên wan kişf bû ku wê mudeheleyek bê kirin. Belê mudeheleya yekemîn ji aliyê tîmekî taybet ve hate kirin. Pankarta ku li ser "Barîş hemen şîmdî (Aştî a niha)" û kevoka ku nişana aştiyê bû, ji aliyê tîmekî taybet ve hate qetandin û piştî wê jî agir bi pankartê xistin.

Dixwestin ku bi vê yekê tirsê bixin dilê heyetê. Lê aştiwazan bi hemû bawerîya xwe li ber xwe dan. Hele di nav aştiwazan de yekî almanî bi navê Dino hebû ku plana wan serobîno kir. Dino li pêşiya her kesî xwe ajot ser wî tîmê taybet. Belê ne tenê Dino hemû kesên biyanî dora gelê ku ji aliyê tîman ve jî erebeyên wan hatibû daxistin girtin. Di vê navberê de balkêştîrîn rûdan pêk hat. Ev kesên ku ji erebeyan hatibûn daxistin, tevî zar û zêç, pîr û kalan nasnameyên xwe derxistibûn, digotin: "Em ji xwediyê welatî ne. Kî kê nahêle welatê kê?" Piştî jî dest bi sloganan kirin.

Ev tişt di senaryoya dewletê de nîn bû. Li gorî senaryoya dewletê wê heyeta aştiyê li Dîlokê bi wan tîmên taybet bihatana tirsandin û ewê ji tirsan bi şûn ve vejeriyana. Lê daxwaza aştiyê û hêviya azadiyê ew çepera ku ji çek û çekdaran pêk dihat qetand û da riya xwe.

Piştî ku em ji Dîlokê derbas bûn, êdî serê pênc deqîqe carekê em ji aliyê leşkeran ve dihatin rawestandî. Ji wê diyar bû ku em ketine axa ku ji aliyê kolonyalîstan ve hatiye dagirkirin. Jixwe hêzên dewletê jî gotibûn "Ev herêma şer e!" Lewre li gorî saeta ku derbas dibû kîna wan a li dijî otobûsa çapemeniyê jî zêdetir dibû. Wên pê zanibû wê tiştên ku diqewimin ji aliyê wê otobûsa çapemeniyê ve li dinyayê bê belavkirin.

Di nav çepera leşkeran da qîrîna aştiyê saet dehê sibehê li Birecîkê bilind bû, nezikî 6 hezar kes di nav çepera leşker û tanqan de civiyabûn. Bi saetan ji aliyê leşker û tîmên taybet ve di bin wê tava germ de hatine rawestandî.

Çawa ku em gihîştin cem wê girseya ku ji zarokan, jinan, pîr û kalan pêk dihat, çoşeke ku mirov nikare binivîsîne kete nav wan. Heyetên biyanî şaş man. Hêvî

nedikirin ku wê ev qas gel li wê derê bicive. Belê rewşa gel a di bin dorpeça hêzên dewletê de kampa dîlan dianî bîra mirov. Bi ser hev de li qadeke li derveyî Birecîkê civayabûn. Li gel hemû çepera leşkeran jî qîrîna ku dikirin li asîmanan deng vedida.

Belê her çiqas heyetên biyan şaş man jî, leşkerên ku ew gel dorpeç kiribûn ji wan bêhtir şaş mabûn. Ew jî ji demeke dûr hetanî vêga li girseyeke wisa rast nehatibûn. Ji aliyekî ve gel dîlan girtiye, ji aliyên din ve heyetên biyan û gelê kurd hev û din hembêz dikin. Hesreta hezar salan ji çavên kal û pîrên kurd xuya dibû.

Mixabin wexta çûna me hatibû. Ji waliyê OHAL ferman derketibû, "Gelê ku li Birecîk gihîştîyê hev, divê ji wir pê de neyê bi vî aliyê de." Bi tenê barîkat ji bo heft otobûsan rakirin. Van biryarên xwe li gorî senaryoya ku nivîsandibûn pêk anîn û



Şikandî

da qîrîna aştiyê saet
lind bû, nêzîkî 6 hezar
û tanqan de civiyabûn.
cem wê girseya ku ji
an pêk dihat, coşeke ku
ete nav wan. Di vê navê
çiya tanqan de dest bi
ş doz e" kir. Gel bi wê
bû. Êdî neçûna Amedê
ne xem bû.



gel ji wir vegeriya.

Li Elîgorê pêşwaziya gundiyan

Saet duwazde û nivê nivro ye, me di pacên otobûsan re nihêrt ku bi sedan gundî, gundiyan Elîgora Surucê çepera leşker û tîmên taybet qetandin û xwe avêtin pêşya otobûsan. Hinek ji wan ji malê pêxwas derketibûn. Tiliya wan li hewayê, nişana serfiraziyê dikirin û daxwaza aştiyê diqîrandin. Di wê navberê de leşkeran jî bi çekan êrişî wan dikir. Lê li hemberî wê êrişê erebeyên me sekandin û gundiyan rê dagir kirin. Ev hesret hesreta salan e, lewre ew mirov kuştinê didin ber çavên xwê, keç û xort pîr û kalên kurdan qîrîn dikirin: "Em aştiyê dixwazin, bijî aşî, gel birayên hev in." Bi rastî jî piştî wê bûyerê em bi hêztir bûn. Gelek kesan li hemberî wê yekê îdare nekir û bi

dest girî kirin. Hele ew heyetên biyan çawa di deriyên otobûsan de dixwestin ku xwe bavêjin nav wî gelfî.

Piştî Elîgora Surucê, em saet li 13.00 yan gihîştin Ruhayê. Hêzên dewletê girseya ku ji bo pêşwazîkirina heyeta aştiyê gihîştîye hev, belav kirin. Ji seriyekî hetanî seriyê din jî aliyê leşker, polis û tîmên taybet ve hatiye girtin. Wê kelîkê me xwe li 12'yê rezberê hesaband. Lê ligel wê yekê dîsa heyeta aştiyê bi girseyeke hindik ango kêma pêşwazî kir.

Piştî sê saet din li gorî hesabê me, emê li Amedê bin. Ji bo sînorê Amedê kêma barîkat mabûn lê, li gorî senaryoya dewletê wê ev serûven hetanî Siwêrekê bidomiyana.

Em ji Ruhayê derketin. Hêdî, hêdî helwesta dewletê tûjtir dibû. Saet li yek û nivê tîmên taybet berê me dane midûriyeta ewlekariya Hêza Çewîk ya Hilvanê. Li wê derê em jî aliyê cigirê midûr ve wekî mêvan hatin pêşwazîkirin. Gelekî nerm û kubar nêzîkatî nişan dan. Em jî li hemberî wê helwestê şaş man. Di vê navberê de biryara waliyê OHAL'ê gihîşte me. Çûna Amedê ya heyeta aştiyê hatiye qedexekirin. Li hemberî wê yekê xewnên herkesî vemirîn. Lê hinekan jî digotin ku hatina me ya hetanî wê derê jî serkeftineke mezin e. Êdî dawiya film dihat. Piştî ku em du saet û nîvan binçav man, biryara berde-wamkirinê derket û heyetê berê xwe da riya Amedê.

Ji wir û pê de helikopteran jî tevî eskorta ewlekariyê bi me re hatanî sînorê Siwêrekê hevaltî kir. Li gorî senaryoya wan em hatibûn dawiya rê. Lê li gorî projeya me gelê Amedê li benda me bû. Çi dibû bila bibûya diviyabû em biçûna Amedê. Mixabin rê bi tanqan û bi barîkata leşkeran û bi alîkariya helikopteran hatibû girtin. Gel ji otobûsan daket. Leşkeran ji bo ku gel şiveriyar re neçe riya çiya jî

asê kiribû. Barîkat li dû hev danîbûn.

Di bin siya tanqan de Strana Mîrwan Bejan

Li hemberî wê helwesta dewletê, delegasyona biyan biryara çalakiya rûniştine standin. Nêzîkî du saetan rûniştin. Di wê navberê de gelekî slogan hatin avêtin. Hêrsa heyeta biyan jî ya me bi gelekî diwartir xuya dikir. Wan sloganên enternasyonalîst digotin û bi dengê bilind "Bijî aşî!" digotin. Di wê aloziyê de dengê ciwan di bin siya tanqan de dest bi strana "Berxwedan xweş doz e" kir. Bi wê yekê ew dilên ku li hemberî qedexekirina Amedê şikestibû, ji nû ve hişyar bû. Rû kenîyan ços hate gel. Li hemberî wê yekê ew leşkerên ber barîkatê şaş man. Fermandarê wan hew dizanibû ku wê çi bike.

Gel bi wê stranê bi ser xwe ve hatibû. Êdî neçûna Amedê jî, ji wan re ne xem bû. Ji ber ku di dîrokê de kêma hewlên bi vî rengî pêk dihatin. Marşa refên gerîla li hemberî tanqan û çekên giran dihate xwendin.

Ji Siwêrekê vegera Stenbolê

Ji Stenbolê hetanî Siwêrekê helwesta dewletê gelekî diwar bû.

Ji Siwêrekê hetanî Stenbolê ketina gund, navçe, û bajaran hatibû qedexekirin. Hêzên ji Ruhayê hetanî Stenbolê hemû rê girtibûn. Bi tevî rolên xwe yê sereke hevaltiya me kirin.

Belê ew kîna ku di ser dilê dewletê

de gihîştibû hev, li Ruhayê bi êrişê xwe ya li otobûsa çapemeniyê vala kir. Mûavinê erebeya rojnamevanan û rojnamevanekî biyan birîndar kirin.

Li Enqereyê jî Rêzga Stewarte

Li Enqereyê jî panzeran em pêşwazî kirin, ketina me ya Enqereyê hate qedexekirin. Li dijî wê kirina dewletê, heyetên biyanî biryara çalakiya rûniştinê standin. Li ber wê yekê polis jî destvala neman. Polisên contirkan, ketibûn erebeya çapemeniyê materyalên wan tev didan. Bi mudahaleya me polisên contirk jî erebeya hatin derxistin.

Êdî em jî şaş mabûn. Her cih jî me re qedexa bû. Pasaportên me jî nîn bûn ku me rasterast derveyî sînor bikin. Aştî ji Kurdistanê dîsa bi me re vegeriya. Bi rastî me jî hew dizanîbû ku emê aştiyê deynin ku derê.

Li Gebzeyê dîsa pêşya aştxwazan ji layê polis û leşkeran ve hate girtin. Li wê derê hêzên dewletê wekî mozên har êrişî me dikirin. Di encama wê rûdanê de, rêwîtiya aştiyê bi binçavkirina 15 qasidên aştiyê bi dawî hat.

AZAD ALTUN



Helbestine bijarte

Xortê hêja

Li hemberî van xwînmija
Te şer danî xortê hêja
Rizgar dikî behr û beja
Bi mêranî xortê hêja

Digerî li çol û çiyân
Dadîkevî serê rîyan
Xwe berdidî nav gundiyan
Bi mêvanî xortê hêja
Rojê Newroz û sersalan
Digerî li nav malan
Hişyar dikî pîr û kalan
Bi rêzanî xortê hêja

Ketî nava refê şêran
Dane dû te jin û mêran
Wan li dengê te guh dêran
Bi heyranî xortê hêja

Rext û fişek li xwe pêçan
Dadigirî sûk û kuçan
Bûy hêviya kur û keçan
Bi şêranî xortê hêja

Têkoşinê dişidînî
Xof û tirsê diqetînî
Tu mirina dijmin tûnî
Bi şervanî xortê hêja

Êrîş kir ser dijminê hov
Bi xwîna xwe av didî tov
Rih û giyan didî mirov
Bi ciwanî xortê hêja

Te çek danî ser wan milan
Tu geş dikî nava dilan
Bûy dermanê dêrd û kulan
Bi loqmanî xortê hêja.

ADAR JIYAN

Jiyana Bêling

Kelkelka girî ye dîsa
Vê êvarê di dilê min de
Nizanim ji bo çi....?

Carina bavê min tê bîra min
Gotinên wî
Yên xweş û rast

jiyana wî ya dawîn
A ku di nav livînan de derbas bû..

Bi hezar hesret û hêvî
tême çavên te
Bi tim daxwazyên dilê xwe ve
dibêm te
Ez tenê bi te kaw im
Û bi te serbilind im bi te

Sonda min bi te
Hewara min ji te
Silav li te!
Tu keça dilpola
Tu egîta dînemêr

Ji derdên xwîné û koledaran
Ji zilm û zordariya hezar salan
Me ked da
Wan em talan kirin, talan
Nahêlan bo me tu derî
tu kolan
Xiravkirin xan û man,
birc û eywan û ban
Bûn êş, bûn jan



Silava Pêşmergeyan

Ketin canê dergûşên kurdan
Bihorîn sal û zeman
Çi ku dinê zivirî
Her çi tişt guherî
Dîsa ew man wisa
em jî wa man

Herimandin ava kaniyên me
gund û xaniyên me
Ne gezek nanê helal
Ne qurcek ava zelal
Êdî xîret qebûl nekir
te ser rakir
Wan em zindan kirin
Te ala berxwedanê li ba kir
Wan em sed caran bêhêvî kirin
Te hezar caran em hêvîdar kirin
Çiqas wan em sitûxwar kirin
Te serê me rakir.

Her çi dijmin bûn rûvî
Tu bûyî şêr

Her çi namerd bûn dûpişk
Tu ji tirsê bûyî têr
Silav li te!
Ey şêrejina dilpola
Ey egîta dînemêr

Dijmin bûn agir
tu bûyî av
Neyar bû lehî
te da nav
Her çi wan em kor kirin
tu bûyî bo me çav

Ew bûn ewr
Tu bûyî bahoz û stêr
Her çi neyar bûne dêw
Tu li dilê dêw bûyî kêr

Geş ke!
Lo bira geştir ke!
agirê şer
Kole em in li welat
Dijmin nehêlin efendî li ser
Wê azadiyê ji eyarê şêr
derxîne der
Ew xîreta te ya mezin
tu kirî mîrxas û mîr
piling û şêr

Bimeşe!
Bila dijmin biqêşe

Lêxe!
Neyar derêxe
Ji jor û ji jêr
Ger mirin tê bila bê
serçavan bixêr
Ger mirin tê bila bê
duhê na pêr

Silav li te!
Ey şêrejina buha zêr!
Ew egîta dînemêr!


MIRAZ RONÎ

Jiyana bêling
Wek welatê bêziman
Wilo derbas bû dema taliyê
Lingê wî sol nedît
Tilîkan jî ling...
Dizanim jêkirina lingê wî
Çirandina dîrokê bû
Lê haya keşî jê tune bû
Wî zanîbû
û
Tilîkên ji ling jêkirî...

Kelkelka girî ye dîsa
Vê êvarê di dilê min de
Nizanim ji bo çi...?

Sar û germ dibe laşê min
Gelo evîni ye dîsa...
Ji dil dikişê mejiyê min
Li ber mirinê
Min vedigerîne jîyanê...
Kelkelka girî ye dîsa
Vê êvarê di dilê min de
Rast e
Tunebûna bavê min e
Min bi girî ve dike
Tunebûna evîne ye
Agir dîniqûtine dilê min
û
Tunebûna welatê min e
Min dihêline...

ŞEXMÛS ÖNAL



Li navendên çandê vê hefteyê

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **13.09.1997 Şemî:** NÇM-Konsera Gulên Mezrobotan, saet:14.30

Dilana Koma Serhildan, saet:18.00

● **14.09.1997 Yekşem:** NÇM-Konsera Koma Agirê Jiyan, saet:14.30

Belgefîlmê Yılmaz Güney "Adana-Paris", derhêner: Ahmet Soner

Saet:18.00

● **17.09.1997 Çarşem:** Semîner "Jin û Malbat", axîfger: Nuray Şen,

saet:18.30

● **19.09.1997 In:** NÇM-Fîlm "Zêmar", derhêner: Y.Güney,

saet:18.00

Li NÇM'ya İzmirê

● **13.09.1997 Şemî:** Konferans "Zimanê Helbestan" Pêşkêşî: Şaîr

Hayri Kako, saet:17.00

● **14.09.1997 Yekşem:** Panel: "Bi jîyan û hunera xwe Yılmaz

Güney" Pêşkêşî: Kazim Öz û Özcan Alper (Ji NÇM), saet:14.30

● **19.09.1997 In:** Konsera Koma Agirê Zerdeşt, saet:19.00

Li BEKSAVÊ

● **13.09.1997 Şemî:** Fîlm: "Dijmin", derhêner: Y. Güney Saet:15.00

● **14.09.1997 Yekşem:** Fîlm: "Rê" rêveber: Şerif Gören Saet: 15.00

AWIR

Festîvala Kurdistanê ya 5'an



Bi bîranîna gorbihuştiyên Hewlêrê, Festîwala Kurdistanê ya 5'an, bi pêşengiyek pir mezin û têrnîgar li Almaniya bajarê Kolnê, Stadyûma Mungersdorfer hate lidarxistin. Roja 6'ê rezberê êvarê refên kurdan ji welatên ewrûpa hatin û li stadyûmê û derdorên stadyûmê civiyan. Roja 7'ê rezberê trîbûnên stadyûmê heya bi pîpînga devê derî hatibû dagirtin, gelek kes jî li derve man. Li gorî ragihandinan, kursiyên trîbûnan heştê û şeş hezar kesî radigire. Her wiha hejmarek ne fermî ku der barê kesên beşdar de dihate diyarkirin, di navbera 130-170 hezar kesî de bû.

Festîval, ji du başan hatibû pê. Di beşa yekemîn de saziyên Kurdistanî hatin danasîn. Di meşa duyemîn de jî axaftinên çandî û politîk hatin kirin û programa rojane hate meşandin. Di hêlên forûman de, çand û medya kurdî hate danasîn û di van wargehan de di navbera nofên xelkê de guftûgo hate kirin.

Li ser taçên trîbûnên stadyûmê fotografên mezin ên gorbihuştiyên Kurdistanê û bi sedan sloganên nivîskî hatibûn daleqandin. Di nav van de sloganên mîna "Ji bo Beşikçi azadî", "ji bo Kanî Yılmaz azadî", "Jina kêr, nişana gelê kêr e, çîna kêr e, mirovaniya kêr e", "Gerîla pêşeroja xelkê ye, hêvî û rûmet e" û "Em ji bo şer jî, ji bo aştiyê jî amade ne." bal dikisandin.

Vekirana festîvalê bi marşa "Ey Raqîp" ku Orkestra Senfonî ya Kurdistanê digot, pêk hat. Orkestra Senfonî ya Kurdistanê ku nû haçîye damezirandin, gava di vê festîvalê de marşa neteweyî lîxist, ji hêla komên xelkê ve bi dilcoşî û çepîkên dilgerm hate berhembêzkirin. Di vê demê de kesên ku bi Trêna Aştiyê Musa Anter re heya bi Siwêrekê çûbûn û li hemberî xwe hêzên dewleta tirk dîtûbûn, civîneke çapemeniyê li dar xistin û ji bo

aştiyê û azadiya kurdan banga xwe nûjen kirin.


Mesaja Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ku ji festîvalê re hatibû şandin bi dilgermiyê mezin û sloganên têrqrîn hate berhembêzkirin. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan di mesaja xwe de bal kişande ser şer û got ku ev şer ne di navbera PKK û dewleta tirk de ye û dewleta terk mîna her car dixwaze agirê şoreşa kurdan bifîne. Lê PKK vê riyê nadê û li çareseriyên bingeşî digere."

Di nava kesên ku di festîvalê de axivîn, Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya, parlamenterê ANC Îmama Gassan Solomon, Serokê Koma Parlamentoyê Haşîm Mahamid ku girêdayî "Eniya Wekheviya Aştî û Demokrasiyê ya Îsraîlê ye" û di parlamentoya Îsraîlê de cihê xwe digirin, Serokê Konseya Kurd ya Norveç Jon Rud, ji Organîzatoran, parlamenterê 90'î yê Keskan Dr. Hisham Hammad û nûnerên aştiyê hebûn. Dr. Hisham Hammad ku bi eslê xwe filistinî ye axaftina vekirinê kir û got ku qonaxa ku gelê kurd tê re derbas dibe, ez jî bi salên dîr dirêj jiyame. Ji sedema ku gelê kurd û gelê filistinî ne xwedî erdekî azad in, xwedî çarenûsiyê wekî hev in. Hammad kesên ku ji bo aştiyê çûn Tirkiyeyê, derketina astengên li hemberî wan jî nixandî û di vê derbarê de bal kişande ser rola dewleta Almanyayê û pêdiviya rakirina qedexeya li ser PKK'ê jî anî zimên.

Piştî axaftinan, heya derengiya şevê kom û kesên hunermend ên mîna, Şivan Perwer, Koma Berxwedan, Metin-Kemal Kahraman, Pêşengiya Folklorê Tamîl Elam, Hozan Şîrîn, Koma Muzîkê ya Iskoçya, komên folklorê, Merziye û Nasir Rezazî, stran û govden û dansên xwe pêşkêş kirin. Festîval jî hêla medya cihanê ve jî bi balkêşî hate şopandin.

AZADIYA WELAT/ ALMANYA

TÎŞK



LERZAN JANDÎL

Nivîsnayenê rind a, la belê...

Ewro (em roj) şarê ma qonaxêde henên ke ganî ma her derheq de bixeberîme. Ha hetê politîkaya aktîfe yan jî pasîf e, ha hetê diplomasi, ha hetê medya de û ha hetê perwerdekerdene de qe ferq nêkeno, kamci het beno wa bibo, ganî ma, her kes angore zanayen û qabîliyetê xo bixebetîyo.

La belê zê xêlê çîyan, hetê nivîsnayene û perwerdekerdene jî problemê girsî vecînê. Çereserkerdena problemanê ke girêdayê mordemî bi xo niyê, teberê mordemî yê, zaf zor niyê û eke mordem meşîkiyo probleman çareser bikero, mordem şikîno ke vaco: "Rind, ez nêşikîna nînan çareser bikerî, çimke çare mi de niyo. Lazim o ke ez tayîna bixebetîye, tayîna sebir bikerî."

La belê karanê ma de gumra kemasî û problemî vecînê, ke nê girêdayê mî bi xo yê. Yanê nê problema ma bi xo vecenîme. Ha bi nezanayena xo, ha bi zanayena xo, ha ebi yardimê heval û dostanê xo.

Na ca zê yew nimûneyî ez wazena yew pirtûkê şagirtan ser ro vinderî.

Nameyê Pirtûkî "Pirtûka xwendin, nivîsandin û hîndariyê ji bo dibistana destpêke û navîn 'Zimanê min Kurdî ye' yanê Zonê mi kurdî yo, pirtûkê wenden, nivîsnayen, mûsnayen, mûsnayene seba dibistanê destcikerdene û werteyî. No pirtûk adare 1997 de Stockholm de hetê M. Elî Tüysüz ra amo viraştene û miyanê Weşanên Înstîtuya Kurdî li Stockholmî de amo çapkerden.

Bê guman viraştên, veten, vilakerden, wendene dayena nê pirtûkî pêro emeg o, pêro ked o.

Pêro pere wo. Qe çiyê hênî rehet nêno masa ser. Qe çiyê bê ked û bê emeg hazir nêbeno. Naye her kes zano. Û her keso ke naye zano, seba ked û emegê karan, qîmetê dano nê karan, înan bêqedr nêvîno. Nivîskar û emegdarên nê karî jî qij nêvînen. Naye ra ganî her kes bawar bo.

La belê meseleya ma na niya. Meselaya ma avêberdena karî, efektîf xebetnayena emegî û vila nêkerdena emegî ya. Ganî ma naca gamanê girsan bierzîme. Xo teyna mevînîme, teng mek eme. Ma ganî îndî karêke ma rê lazim ê û karê ke ebi kalîte yê, înan bivecîme. Seba nayê jî ez wazena nê pirtûkî ser ro vinderî.

Eke no pirtûk hetê yew mamosteyî ra /musnedarî ra niyamêne amadekerdene û no musnedar jî çand serî Swêd de derse medêne sinifa 7,8,9 îne, mi bo no pirtûk rexne nêkerdene. Mi vatene yew "yew welatparêzêde kurdî hundê ked û emeg do no kar kerdo, her çîqa ke kemasîyê xo estê jî, hurmetê mi ci rê esto."

La belê mesela niya niya: M. Elî Tüysüz musnedar o, derse dano sinifa 7,8,9'îne. Û ser de jî no pirtûk wertê weşanên Înstîtuya Kurdî de veciyo.

Gelê biraya! Her çî hetê de qe kesî no pirtûk kontrol nêkerd. Se yew pirtûk hem seba dibistanê destcikerdene û hem jî dibistanê wertê rê beno? Şagirtê dibistanê destcikerdene herfanê nê pirtûkî se biwano? Şagirtê feqîr wenêyê astorî (hesp) rûpela 13'yîne de, saye (sêv) rûpela 19 de, astorî (stêrk) rûpela 2'yîne de, Koyê de Kurdistanî ser ro yew dare (li ser çiyayekî Kurdistanê darek) rûpela 127'îne de se bişinasno û se fam bikero?

Kamci pedagog şikîno nê çîyan fam bikero, yan jî seba nê çîyan vaco: "Ma se bikeme, îmkanê ma hundê rê. Destê ma ra hundê êno."

Nê, ez bawar kena ebi ê kedî, ebi ê emegî, ebi ê armancî mordem şikîyêne pirtûkî tayîna rind û dewletî bivetêne. Înstîtuya Kurdî jî ganî na mesela de rind bihesabnêne. Çimke ebi hemxebat, ebi kooperasyon û ebi hetkariya perwerdekerdanê kurdan ê bînan mordem şikîyêne no kar tayîna qenc bikerdene.

Hêvî kena ke pirtûkanê bînan de ha nivîskar ha întîtasyonê ma balê xo şanenê na meselaye.

Malê min ji Miheme û Miheme re lê, ne ji Miheme re!

Sê lawê Keleş hebûn, bi navê Mihemed. Apê Keleş kesekî kokim bû. Temenê wî li dora 80-90 salî bû û nexweş li ber rehma Xwedê bû. Rojekê bangî zarokê xwe kir û ji wan re got: "Wek hûn dibînin rewşa min ne pir baş e. Ez li ber rehma Xwedê me. An îro an sibê ezê bimirim. Wesiyeta min li we, malê minî heyî, erd û zevî, ji Miheme û Miheme re, lê ne ji Miheme re. Piştî ez bimirim hûnê li hev rûnin û hûnê fahm bikin bê ka mi malê xwe ji kê re hiştiye."

Apê Keleş piştî çend roja dimire. Miheme, Miheme û Miheme li hev rûniştin û ji hev re dibêjin ka em çawa bikin. Dikin nakin tu riyê nabînin, dibêjin: Emê herin cem mindîûmûm (Qaymaqam) û dikevin rê, berê xwe didin cem mindî ûmûm.

Di rê de kesek digihê wan û dibêje:
- Gelfi hevalan, dundila (deve) min winda bûye, gelo we nediye?

Birayê mezin:

- Dundila te bi çavekî ye?
- Belê

Birayê navîn:

- Barê wê dims e?
- Erê weleh te jî rast got.

Birayê Biçûk:

- Teriya wê qut e?
- Erê wûn rast dibêjin, lê ka dundila min we çi kir?

- Me dundila te nediye.

- An hûnê dundila min bînin, an jî ezê we bibim cem mindîûmûm.

Her sê bira dibêjin: "Heyran me dundila te nediye, hema ku tê têxî stûyê me, em jî diherin cem mindîûmûm, haydê em tev de herin."

Qederekê diçin, kesekî din digihê wan û dibêje:

- Hevalno, pîreka min di vê rê de derbas bûyî we nedîtiye?

Birayê mezin:

- Pîreka te xeyidî bû?
- Belê, xeyidî bû.

Birayê navîn:

- Bi ducan (hamile) bû?
- Raste, ducanî bû.

Birayê biçûk:

- Xwedê zane pêxwas e jî?
- Rast e, pêxwas e, ka çû-ku?
- Me pîreka te nediye!

- Çawa we pîreka min nediye, hûn bi her tiştê wê zanin û hûn dibêjin me nediye, hûn jî ku tinin bînin, divê hûn bînin an jî we tiştêk pê kiriye?

- Heyran, me pîreka te nedîtiye, lê belê em diçin cem mindîûmûm, tu dixwazî tu jî were.

Rewiyê me dibin pênc û berê xwe didin cem mindî ûmûm.

Derin jûra (oda) mindîûmûm, mindîûmûm gişkan distîne cem xwe û pêşî derdê her sê birayan pirs dike. Bira derdê xwe dibêjin. Kesê din jî dibêjin.

Mindîûmûm lê dinêre ku derdê her sê bira ji derdê kesan bêhtir e, dibêje: "Pêşî em doza van kesan hal bikin." Xwe-diyê dundil derdê xwe û çî hatiye serê wî dibêje.

Mindîûmûm:

- Li gor xwedî dibêje we dundil biriyê. Ka hûn dibêjin çî? Birayê mezin:

- Me rewşa xwe ji te re got. Gava-em ketin rê, min nihêrî giyandarek bi rê

Birayê biçûk:

- Bidom li ser axê meşiya bû, xuya-bû pêxwas e.

Mindîûmûm ji her du kesan re got: "Rabin herin, haya van ne ji dundil heye, ne jî ji pîrekê heye, herin ji xwe re li yekî din bigerin." Mindîûmûm her sê bira ezimandin mala xwe. Fikirî û got: "Yareb, ezê çawa rewşa van ha bikim." Rabû ji wan re xwarina bi goşt, goştê sêlê çêkir, danî ber wan û çû di bixêrî-

- Çawa mêvan dibêjin goştê kûçikan e.

Şivan:

- Wextê berx biçûk bû, diya wê mir û ew jî diçû diket bin dêlika me, ji dêlikê şîr vedixwar.

Mazûban bazda çû cem kevaniyê, kevaniyê got:

- Wele rûyê min ji te reş be, rast e min xwe neşûstibû. Çû cem diya xwe, diya wî jî vir de bir, wirde anî û lê nêrî ji rastiye xwestir tune, got: "Kurê min kesekî xulamê me hebû, gava bavê te ne li mal bû ew dihat cem min."

Mazûban vegeriya cem mêvanan û ji wan pirsî bê çawa zanîbûn bi van tiştan.

Birayê mezin:

- Bi rastî min nizanîbû, hema wextê tu ji bavê xwe bûya te yê bi me re nan bixwera.

Birayê navîn:

- Rengê goşt sor bû û ne wekî goştê giyandarên din bû.

Birayê biçûk:

- Min dikir nedikir nan nedihat cûtin û di qirka min de derbas nedibû.

Mazûban lê nerî ku îşê wî zor e. Berê xwe da cem keça xwe, keça wî Zarîn keçik pir bi hiş bû. Derdê xwe ji keça xwe re got. Keça wî ji bavê xwe re got:

- Tiştêk nabe, tu wan bispêre min, ezê doza wan çareser bikim. Lê belê tu qarişî navîna min û wan nabî." Bav şertê keça xwe qebûl kir û xwe ji navîne da alî.

Keçê, cihê xwe li jûra kêleka wan danî û ku bû şev dest bi planê xwe kir. Pêşî bangî (gazî) birayê mezin kir, kişand jûra xwe û jê re got: "Ez dixwazim ku ez bi te re bizewicim, lê hema şertên min hene." Bira, gava lê nerî ku keçik mîna felqekî heyvê ye, jê re got:

- Ka bibêje şertê te çi ne? Zarin got:

- Tuyê herî hestiyê bavê xwe ji tîrbê derxî û bavêjî nava pîsiyê." Bira lê nerî ku şertekî zor e, şertê wê qebûl nekir û vegeriya jûra xwe. Keçê bang kir birayê navîn û wî jî qebûl nekir û keçê bangî birayê biçûk kir. Ji wî re jî şertê xwe got. Birayê biçûk got:

- Tu dixwazî ez li pêş çavê te wer bikim.

Bû sibe keçê derdê wan ji bavê xwe re got û malê Apê Keleş ma ji Miheme û Mihemê yê mezin re.

Çiroka min heya vira, rehme li dê û bavê guhdara.



de çûbû û bes li hêlike rê çêriyabû. Ji ber vê min zanîbû ku bi çavekî ye.

Birayê navîn:

- Ji ber ku komê mêşa li ser şopa wê bû min zanîbû ku barê wê dims e.

Birê biçûk:

- Komê mêşa li ser rê hebû, hema bişkûlê wê bela nebûbû, bi vê min zanîbû ku teriya wê qut e.

Mindîûmûm derdê zilamê pîrekê ji fahm dikir û dipirsî ji hersê bira.

Birayê mezin:

- Min zanîbû ku pîreka wî xeyidiye, çimkî her ku deh gav avêtibûn zivîrbû li dû xwe nihêrîbû.

Birayê navîn:

- Di rûniştin û rabûna xwe de destê xwe dabû erdê. Ji ber vê min zanîbû ducanî ye.

kê (kulek, rojîn) re li wan guhdarî kir.

Bira hem nanê xwe dixwarin û hem jî ji xwe re mijûl dibûn. Birayê mezin got:

- Ev mazûbanê me ne ji bavê xwe ye.

Birayê navîn got:

- Ev goşt goştê kûçika ye.

Birayê biçûk got:

- Kê ev nan çêkiribe ne paqij e (ce-nabet).

Hişê mazûban li hev ket û çû cem şivan, got:

- Te çi şerjê kir?

Şivan:

- Min berx şerjê kir.

Mazûban:

BERHEVKAR: RIZA ASLAN/
GIRTÎGEHA AYDINÊ

Ji Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê berhemeke perwerdehiyê

Bi xurtbûna tevgera azadî-waz a kurd re, di warê çand û zimanê kurdî de jî hin gavên berbiçav tên avêtin. Înstîtuyên kurdî ku li cihên cur bi cur hatine vekirin, bingeha perwerdehiya neteweyî ava dikin. Ji bo perwerdekirina zarokên kurd material amade dikin.

Pirtûkên dersê ku heta niha hatine nivîsandin, li gorî perwerdehiyêke bi rêk û pêk nehatine amadekirin. Ev kar hê li hêviya pedagoj û mamostayên kurd e.

Di vî warê de berhemeke baş Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê dave. Vê înstîtuyê jî bo zarokên dibistana seretayî û navîn pirtûkek amade kiriye. Ev pirtûka bi navê "Zimanê Min Kurdî ye", ji hêla M. Elî Tüysüz ve hatiye amadekirin. Tüysüz di pêşgotina pirtûkê de di-de zanîn ku ev serê çend salan e ku mamostetiya zarokan dike, wî dîtiye ku berhemên heyî bersivê nadin daxwaza perwerdekarên, lewre dest avêtiye vî karî.

Pirtûka navborî ji heft beşan, 162 rûpelan pêk tê. Çapa yekemîn a pirtûkê di adara 1997'an de hatiye kirin. Di her beşeke vê pirtûkê de digel tekstekê, navê çend tiştan li bin wêneyên wan û hin mijarên li ser rêziman cih girtine. Dîsa di dawiya hemû tekstan de pirsên

Pirtûka xwendin, nivîsandin û hindariyê jî bo dibistana despêkê û nav



**Zimanê Min
Kurdî ye**

têkildarî tekstê û bi peyvên di nava tekstê de ji zarokan nivîsandina tekstekê tê xwestin. Zarokên ku hinekî xwendin û nivîsandinê dizanin, dikarin jî vê pirtûkê sûdê wergirin, bi alîkariya wê fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bibin, agahiyên xwe yên li ser zimanê kurdî bi pêş ve bibin.

**Hûn dikarin vê pirtûkê
ji vê navnîşanê bixwazin:**
Fridhemplan 13, 3tr 112 40
Stockholm/Sweden
Tel/faks: 0046 8 652 34 29


Jiyana Rewşen xwe nû dike

Hejamara 12'yan a kovara Jiyana Rewşen derket. Di pêşgotina kovarê de tê diyarkirin ku, wê piştî hejmareke din kovar jî aliyê teşe û naverokê ve bê guhartin. Her wiha di pêşgotinê de li ser helwesta dewleta tirk û împeryalistan a li hemberî aştîyê jî tê rawestîn û pêwistiya aştîyêke birûmet tê zimên.

Di hejmarê de belkî nivîsa herî pêşî balê dikişîne nivîsa Şiyar C. Oremar a bi navê "Şoreşa bakurê Kurdistan û Hekariyên wê yên mezin li ser Başûr û rojhilatê Kurdistanê". Oremar bi xwe jî rojhilatê Kurdistanê ye. Di vê nivîsê de ew li ser bandorên Teverga Azadiyê yên li ser Rojhilat rawestiyaye. Bi peyragihandina Oremar, hêviya Rojhilatê jî Teverga Azadiyê ye. Lewre jî keç û xortên rojhilatî her diçe bêhtir beşdarî nav refên gerîla dibin.

Her wiha wergera Kawa Nemir ya li ser jiyana William Shakespeare jî hêjayî bahsê ye. Dîsa Nuray Şen bi zimankî helbestî û bi şeweyekî hestiyarî li ser evîn û hesreta welat nivîsek nivîsandiyê. Di vê nivîsê de biwêjên wekî "...madê gelek dewletên dagirker bi-jandiyê", "...jiyaneke nebatî dijî...", "...bi evîne ve hevîr bûye", "... dilê kurdan giriyar" ku ji tirkî hatiye girtin, tama nivîsê kêm dikin.

M. Zahir Kayan jî di nivîsina xwe de li ser afirîner û taybetmendîya hunermend sekiniye. Wekî din Hamdullah Bakî, der barê jiyana romannivîsê



navdar Albert Camus de nivîsek amade kiriye. Feqî Huseyin di vê hejmarê kovarê li ser jiyana Pertew Begê Hekarî nivîsînek darêjtiye.

Di vê hejmarê de giraniya çirokan jî xwe dide pêş. Çirokên Harbi Soylu, Metin Herûnî, Hesên Zinar, Pîr Rûstem, A. Rahman Çelîk, Abbas Alkan di vê hejmarê Jiyana Rewşenê de cih digirin. Ev hejmarê Jiyana Rewşenê jî hêla helbestan ve jî têr tijî ye. Di vê hejmarê de helbestên Jan Dost, Amed Masûm, Hozan Dilzar, İbrahim Aydoğan, Zûlfikar Tak, Şêx Evdîrehmanê Axtêpî, Kawa Nemir, Şengal Lûmî, Mehmed Mehmedî hatine weşandin.

SERWÎSA ÇANDÊ

Rastî tahl e

JAN DOST



Mazhar Gunbat dostekî min î kevn e. Dostê kevn jî wekî meya kevn bitesîr in. Hestên mirov tevdidin û birînen wî dijînin. Xuya ye ev dost jî xwendina nivîsên me re vala ye. Ev yek jî tiştêkî seyr e di vê demê de, angoyên wekî wî kêm in, yan jî nîn in.

Berî demekê nameyêke wî kete destê min, tê de nivîsîbû: "Ez nivîsên te yên rojnameyê dixwînin, lê ne bi te re me. Tu hin rewşan zêde dramatîze dikî."

Birayê Mazhar, bi Xwedê rewşa me, bi taybetî jî rewşa me ya çandî hew jê kambaxtir û xerabtir heye. Em bi sê bi alfabeyan dinivîsin; erebî, kirîlî, latînî... Ez nizanîm bi çend zaravayan pirtûkan çap dikin.

Haya Başûr ji Bakur tune, haya Rojhilat ji Rojava nîn e.

Ez nikarim di nava pûk û berfê de, baran û zeqemê, bager û bahozê de bibêjim: Dinya bihar e, giha li çongê ye, mirov bi bêhna kulîlkan serxweş dibe. Berî 300 salî seydayê mezin Ahmedê Xanî, wî jî rewş dramatîze dikir û digot: "Bazar di kesatê de ye û kes qumaşê me nakire." Rewş wekî xwe maye, bazar hîn di kesatê de ye, qumaş di ser hev de riziyan.

Rastî tahl e û her çiqas tahl be divê mirov rewşê bîne zimên. Hecî Qadir helbestvanekî me yî herî mezin e, lê gelo em dikarin berhemên wî bixwînin û fêm bikin? Her wiha Goran, Nalî, Salim, Hêjar, Hêmin... Eger ne bi riya wergerandinê be, em peyvekê jî ji berhemên wan fêm nakin.

Heta, digel ev qas înstîtû, saziyên wêjeyî, kovar û rojnameyên renga reng, em li ser navê mehan li hev nakin. Her kurdekî meha wî bi rengekî ye. Tu dizanî ew rewş wekî çi ye? Ev rewş wekî

ku çend girav di nava oqyanûseke mezin de bin, ne gelekî dûr hev in û ne jî nêzîkî hev in. Her giravek bi tena xwe jiyana xwe didomîne, tu qayîk nîn e vê giravê bigihîne wê giravê. Hîn jî vê kambaxtir di nava giravekê bi xwe de jî zeviyên ji hev cuda hene. Yanê di eynî zaravayî de sê çar zaravayên herêmî cihêreng hene û mixabin bi hemûyan jî tê nivîsandin.

Îcar dema ez li ser van rûpelan dikim qîrîn û gazinan dikim, ez doza dermanan dikim. Ne tenê birînan raberî xwendevanan dikim. Doza me ew e ku ew sînoren asê yên ku civaka kurd ji hev qetandine, ji navê rabin û kurd werin ba hev, wekî hev bifikirin, armancên wan bibin yek; bi yek ziman û yek alfabeyê binivîsin û saziyên wan rast sazî bin, projeyên wan ên çandî cîdî bin û pêk werin. Divê em xwe nexapînin, bi cesaret û cegermendî li şaşiyên xwe xwedî derkevin, da ku di pêşerojêke nêzîk de em çareyekê ji van astengiyan re peyda bikin.

Dema berê li gundekî mirovekî pir feqîr hebû, navê wî Qulî bû. Bi koçmali di bin destê dewlemendan de bû. Û di bin bandora van de dixebitî. Lê jina wî qet nedixwest di bin destê tu kesî de kar bike. Navê wê Çûkê bû. Ramanê xwe ji mêrê xwe re got: "Ger tu nebî mele, ezê ji cem te biçim. Jinên meleyan, tu karî ji kesî re nakin, ne di bin destê tu kesî de ne, jiyana wan xweş e. Ez jî jiyana xweş dixwazim. Tu çi dikî bike, divê tu bibî mele."

Qulî ji Çûkê pir hez dikir. Nedixwest dilê wê bihêle û lewre jî jê re got: "Qizê Çûkê, ez mirovekî feqîr im, ez dizanim tuyê serê min têxî belayê, dev ji min berde. Ez kî me, meletî kî ye?" Lê belê Çûkê hêsanî kiriye serê xwe û çavên xwe berdane jiyaneke pir hêsan. Zorê dide Qulî ji bo meletiyê.

Qulî bêguman (bêhêvî) dimîne û ji bo ku biçê li gundekî bibe mele, digere. Li gelek gunda digere, di dawiyê de li gundekî karê meletiyê dibîne. Roja îne diçin xutbê, nizane xutbê bixwîne, di hundirê mizgeftê de li derdora xwe mêze dike û radibe ji nişka ve direve. Civat dide dîv wî, derdikeve derva. Çawa civat ji mizgeftê derdikeve, mizgeft xera dibe, wekî ku zelzele çêbibe. Jê re li hev tê, gundî dibêjin meleyê me gelekî zana ye, çi bixwaze jê re melûm e. Ew hew vedigere wî gundî. Li gundekî din digere. Dîsa li gelek gundan dipirse, di

Mele Qulî



dawiyê de gundekî biçûk dibîne. Kes bi mele qail nabe, ji ber ku cira wan pir nexweş e û feqîr in. Jê re dibêjin: "Em hevûdin nas nakin, lê şertekî me heye, ger tu zanibî em dê te bi meletî qebûl bikin, ger tu nizanibî xêr li riya te be." Qulî şertê wan qebûl dike, dibêje: "Şer-

tên xwe bibêjin, ez binêrim şertên we yên giran çi ne?"

Gundî tasek (zerikek) dernixum kirine û ji mele dipirsin: "De ka bêje: Çi di bin vê tasê de heye?" Mele diqehere û jina wî tê bîra wî û axîneke ji kûr ve di-

kişîne. Dibêje: "Ax ax... Çûkê te çi kir serê Qulî." Gundiyan jî çûkek û quliyek xistine bin tasê, dema mele behsa çûk û qulî dike, gundî hema tasê diqulibînin. Dibînin ku qulî di nav nikulê çûkê de ye. Dibêjin wela melayê me zanibû ku çûk qulî dixwe. Ji ber wî got: "Ax çûkê te çi kir ji serê qulî". Wê neqelê jî ji mele re li hevdu tê. Û mele li wî gundî dest bi meletiyê dike. Rewşa meletiya wî xweş dibe. Jina wî jiyaneke hêsan berdewam dike, lê heta derewawî tê der.

Dema gundî diçin rehmetê, mele wan dişo û diayan li ser wan dixwîne. Lê belê, ew kê dike gorê ji wan re dibêje: "Ji vî û heta bîrê." Gundî jî dengê xwe dernaxin, dibêjin qey edet wisa ye. Rojekê kesekî dewlemend dimire. Dema mele wî vedişere jê re dibêje: "Ji bîrê û hindik wê de." Qulî difikire dibêje min wisa got wê hîn zêde tişt bidin min. Gundiya ji mele re dibêjin: "Te ji hemû miriyan re digot heta bîrê, lê te ji wî re xelet got. Em bawer in tu tiştêkî nizanî." û lê tîrş dikin. Mele direve, canê xwe bi zor xelas dike.

M. EMİN ALTUĞ

BI XELAT...


XAÇEPIRSA BI XELAT (85)

XAÇEPIRSA

Ş	G	H	E	E	E	E	Z
U	S	U	F	Ç	E	T	Î
X	E	K	Î	K	A	R	Î
D	Î	S	T	A	A	Î	Î
Î	D	Î	I	A	N	Î	N
U	T	Ş	Ê	M	A	T	Z
T	D	S	S	E			
Ê	E	K	R	O	L		
Â	R	A	M	Î	E		
A	S	Î	A	S	Î	T	

Bersiva Xaçepirsa 83'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 85'an, Kasetê Xanemîr "Welatê Rojê" ye




Jêrenot: - Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 83'an kasetê Şivan Perwer "Zembîlîroş" qezenc kirine: Bêrîvan Altunışık/Batman, Mehmet Sancak/Bartın, Neytullah Aydemir/Edene Mustafa Demirbilek/Riha, M. Emin Azık/Batman

Piştigiri Kurê Qazî Mihemed (wêne)	Qad Baxê ...	Cinavkeke kesane Qertafekê tewangê	Hidrojen Raman	Nîminend eti Mehele	Fikîr
				Çewal	
Welatek Şert, hoy			Leydi.... Kurkîrîn		
		Cetwelek Bi kirdkî adir		Derd Gihanekek	
Ez baş ... Îşkembe		Agîr Taybet, xusûsî	Kîjk	Pêşgîrek	
	Gorî Dildarî			Mem û... Tune	
Herîşin Tûrp					
			Temen Kanê		
Nêz (herêmkî) Kukurt		Jêderk			
3	Sembol				

PEYVA VEŞARÎ





Demirel kêşeya kurd red kir

Roja 10'ê rezbera 1997'an heyeta HADEP'ê bi rêberiya Serokê Giştî Murat Bozlak re hevdişnek digel serokomarê dewleta tirk Süleyman Demirel pêk anin

Di hevdişnê de HADEP'yan raporeke ku ji 6 rûpelan pêk dihat pêşkêşî Demirel kir.

Di raporê de ji dewletê ev tişt hatin xwestin:

- Pirsgerêka kurd, bi awayekî dadyane û demokratîk bê çareserkin.

- Raman, bawerî, xwe îfadekirin û rêxistinbûn bingeha demokrasîya rastîn e, divê astengên li ber van yekan ji holê werin rakirin.

- Divê "zagona efûyê" bi awayekî berfireh were derxistin, sîstema hûcreyî ya girtîgehan divê neyê rojevê, şertên tenduristiyê werin başkirin.

- Divê sîstema Rewşa Awarte, fîmên taybet û cerdevaniyê ji holê bê rakirin.

- Kesên ji gundên xwe hatine derxistin, divê bê şert û şîrût vegera wan bê misogerkirin, ziyarên gundiyan bê tanzimkirin.

- Çeteyên dewletê û kesên ku bi çeteyan re eleqedar in divê bêne eşkerekirin.

- Divê rê li ber "lîstina bi hestên olî" were girtin, dewlet demêke zûtirîn dest bi sîstema perwerdehiya demokratîk bike.

- Her partiyeke siyasî, divê bi awayekî adilane û wekhev ji alîkariya xezîneyê para xwe bigire, bikeve hîlbijartinên azad, li gorî dengên ku standine bêyî "sîstema pêşbirkê" (baraj) parlementeran bişîne meclîsê.

- Parlamentoya nû, divê li gorî rastiya gel amadekariya zagona bingehîn a nû û demokratîk bike.

Di heman rojê de piştî hevdişnê HADEP'yan, DBP'ê jî ligel Demirel pêk anin. Di hevdişnê de Demirel, hebûna kêşeya kurd înkâr kir û piştevaniya terora dewletê kir.



"Çanda me bi NÇM'ê geş dibe"

Saziya gelê Mezopotamyayê, ya zanistî, çandî û hunerî Navenda Çanda Mezopotamya, şaxa xwe ya Amedê ji nû ve ji xizmeta gelê xwe re vedike. Evîna me ya ji bo gelê me, rêz û girêdayîbûna me ya ji bo şehîdên me, ji me re dibe hêz û baweriyêke ciwan.

Roja şemiyê (13.09.1997) li Amedê di "Tesisên Demirok" de şahiyek vebûnê emê li dar bixin. Beşdarbûna we wê hêze bide me.

"Çanda şoreşê li NÇM'ê tê afirandin."
NÇM Navenda Giştî - Stenbol



Yağfar Uygur Şemseddin Işık (Şores)

Wekî Dijle bédeng,
wekî Ferat bicoş
wekî Ararat bi heybet
Wekî Sîpan berz
Û bi qasî Cûdî serbilind
wekî ava Zapê paqij
zelal û bi hêrs bûn.

Ew ji bilî berxwedan, şores
û layiqî gelê xwe bûnê
li tiştêkî nefîkirin.
Ew her tim di riya şoreşê de
bi mîlîtanî meşîyan
Bêrawestan şer kirin
Ji dil û can li xwe dan.

Em di salvegera şehîdketina we ya duyemîn de we
û hemû şervanên şoreşê bi bir tînin.

Hevalê we Sabrî Omerî

Ferhengok

barûdox: rewş, zûruf, hal

bişkul: pîsiya pêz

çavpêketin: hevpeyvîn

çespandin: pesendkirin, teyîdkirin

danexwe: hewldan

derûnî: psîkolojîk, ruhî

destnîşan: tespîtkirin

ezimandin: hewandin

giyandar: ruhber, giyanewer

helî: herî, tewrî

jîndarkirin: dimenkirin (canlandîrman)

karesat: bobelat, trajedî

kone: fênek

konevanî: ramyarî, siyasî

kurtebêjok: kurteçîrok, hikaye

kujyar: kujer, mêrkuj, qatîl

lawaz: qels, jar, zêif

layengir: aligir, piştevan

lêwerkirin: reşandin

mazûban: ezimîner

mişt tîjî: heya serî û dev tîjî

nîmînende: nûner, temsîlkar

pergal: sazûman, sîstem

pêşwazî: pêrgîni (karşilama)

qeşîn: cihênimîn (def olmak)

qewîfî: xwestek, tembîh

rex: cem, ba, nik, hind

rêzdar: birêz

talî: dawî

teng: sewiyê

teqez: misoger, mutleqe

vebirîn: fezlekî (özet)

xwebêj: wate, mana

xewneresk: kabûs

xesirîn: xesardîtin, pelişîn

xislet: taybetî, xusûsiyet

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpirsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpirsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRİYAY Dağıtım

NÜNERÎTİYÊN ME
(Temsilcilerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)

Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jan Dost
Helîm Yûsiv

Berlin:
Silêman Sîdê
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robîn Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

Wêhşeta 12'ê rezberê û kêfa generalan

Parêzer Gülçin Çaylıgil: Min dixwest ku resamek wêneyekî ku 27 zarokên di bendekî de hatine daliqandin çêbikira ji Kenan Evren re bişanda. Yê din jî Tahsin Şahinkaya ye ku di qapaxa kovara TIME'ê de wekî kesê herî dewlemend ê Tirkîyeyê hate çapkirin, lê tu kesî devê xwe venekir peyvek nenivîsand. Gelê me jî îşkenceyan re jî bêdeng û bêhest e ez vê bêhestbûnê tu car efû nakim

Di 75 salên komara tirk de çar serhildan, sê darbeyên fermî yek jî ne fermî, daliqandina nêzîkî 600 kesî û bi hezaran cîneyên failî meçhûl pêk hatin; bi hezaran kes di girtîgehan de hatin qetilkirin. Piştî her darbeyê qetlîamên herî mezin di girtîgehan de pêk hatine. Qetlîama duyemîn jî di warê çand û hunerê de pêk hat. Generalên ku çand û huner qedexe dikirin, mixabin îro tabloyên qetlîamên xwe çênakin, tabloyên bedewiya Marmarîsê çêdikin.

Dîsa salvegera derbeyeke ku di dil û mêjiyên gel de birînên kûr vekirine, hat; derbeya 12'yê rezbera 1980'î. Pir kes jî vê mêjûyê qet hez nakin, ji ber ku mecbûr in

di grevên birçîbûnê de mirin, Kemal Pir, Hayri Durmuş, Ali Çiçek, Akif Yılmaz jî di nav wan de bûn. Sal 1996 12 kesên şoreşger dîsa di girtîgehan de di grevên birçîbûnê de dimirin. 300 kes bi awayekî hatine qetilkirin, lê wekî ku întîxar kirine hatine nişandan.

30 hezar kes jî Tirkîyeyê reviyar welatên din bûn multecî. 14 hezar kes jî hemwelatîya Tirkîyeyê hatin derxistin. 8 Rojname 195 rojan hatine girtin, 3 rojname hatine girtin. 937 filmên ku jê bêhna şoreşgerî û dijberiyê dihat, hatine qedexekirin. Piraniya wan, filmên Yılmaz Güneş bûn, Yılmaz Güneş bi xwe jî avêtine girtîgeha Ispartayê. Di nav wan filman de filmên Yavuz Özkan bi navê Riya hesin (Demir Yol), Maden naveroka van

filma li ser têkoşîna karkeran û telebeyan li hemberî faşîstan bû.

Tiştê balkêş ev e ku filmê ku ji romana Kemal Tahir a bi navê "Yorgun Şavaşçı" hatibû kişandin, ji ber ku gelê tirk di "şerê rizgariyê de betilî nişan dide" jî aliyê Serokê Cuntayê Kenan Evren ve bi taybetî hatibû qedexekirin, heta filmekî Kemal Sunal bi navê Kibar Feyzo û filmekî Orhan Gencebay ku sahneyeke meşê tê de heye, hatine qedexekirin.

251 pirtûk hatine şewitandin, ev pirtûk tevî li ser dîtîna û ramanên komunîzm û civaka sosyalîst bûn. Qedexekirin û şewitandina van pirtûkan îro belayeke mezintir bi navê "irtîca" anî serê wan. Her wiha her qetlîamêkê li serê generalan belayeke din vekir.

Qetlîamê generalan

Erdal Eren jî aliyê dewletê ve bi sûcê ku wî cendermeyerê kuştîye tê girtin, di nava 3 mehan de tê darizandin û daliqandin. Di dîroka Tirkîyeyê de du darizandinên din wiha bi lezîngî pêk hatibûn; darizandina Şêx Seîd û Seîd Riza. Wê demê jî bi şev meclîs hatibû berhevkerin û di nava du saetan de qanûn hatibû derxistin bi serê sibehê re ev hatibûn daliqandin. Doza Erdal Eren hinekî

dişibî van dozan. Îro jî girtiyekî PKK'ê bi navê Metin Şahin eynî bûyerê dijî.

Diya Erdal Eren bi salan e hê bi psîkolojiya daliqandina Erdal dijî her tim jî bend ditirse, dema bend dibîne dengê gewriya kurê wê tê bîra wê.

Li gorî pir hiqûqnasan diviyabû general bihatana darizandin ji ber ku wan Qanûna Bingehîn a Tirkîyeyê îxlal kiribû. Lê generalan ji bo ku cihê xwe saxlem bikin madeyek li Qanûna Bingehîn zêde kirin; ev jî madeya 15'an bû ku hê jî wan diparêze.

Hiqûqnas Gülçin Çaylıgil ku di 12'ê rezberê û darbeyên berî 12'ê rezberê de jî parêzeriya kesên wekî Çetin Altan, Turan Selçuk û kesên siyasî kiribû dide xuyakirin ku di sala 1978'an de DGM li

gorî Qanûna Bingehîn û hiqûqê nehatine pejirandin, lê îro DGM cezayê îdamê didin. Gülçin Çaylıgil wiha didomîne: "Darbe li welatê me ne wekî welatê Amerîkaya Latîn in. Li ser hev tene kirin û kesên ku darbeyan dikin jî nayên darizandin û gelê me jî pir zû tiştan ji bîr dike. Niha Evren tabloyan çêdike. Min dixwest ku resamek wêneyekî ku 27 zarokên di bendekî de hatine daliqandin çêbikira jê re bişanda. Ev peyva Evren 'Ma em wan bi dar ve nekin, xwedî bikin?' çawa tê jî bîrkirin, di ser van gotinên Evren re kesên ku ew roj dîtine qet şerm nakin diçin li ber wêneyên ku Evren çêkîrine çepikan li hev dixin. Yê din jî Tahsin Şahinkaya ye ku di qapaxa kovara TIME'ê de wekî kesê herî dewlemend ê Tirkîyeyê hate çapkirin, lê tu kesî devê xwe venekir peyvek nenivîsand û negot: Gelo vî zîlamî ew qas milk ji ku aniyê? Gelê me jî îşkenceyan re jî bêdeng û bêhest e, ez vê bêhestbûnê tu car efû nakim"

17 sal piştî darbeyê çî guherî

Kesekî ku piştî darbeyê çar caran wezîrtiya dadê kiriye, îro dîsa li ser kar e, ev kes piştî darbeyê jî kuştina bi dehan


girtiyar berpîrs tê girtin û ev kes bi giştînameyên xwe yê navdar tê nasîn. Navê vî kesî Oltan Sungurlu ye. Oltan Sungurlu bi giştînameya xwe ya 1'ê gelawêja 1989'an di rojê malbatên girtiyar de cih girt. Girtiyên ku 35 rojan di greva birçîbûnê de bûn, ji Girtîgeha Naziliyê sewqî Eskişehirê kirin û du girtî mirin. Ji sala 1986'an bigire heta sala 1990'î Sungurlu sê caran bû Wezîrê Dadê, di her carî de giştînameyên xwe di girtîgehan de wehşet pêk anî. Oltan Sungurlu li hemberî rakirina cezayê îdamê ye û li gorî Sungurlu axaftina bî zîmanê kurdî parçekirina Tirkîyeyê ye.

Ji pêkhatina darbeyê heta niha bi dehan kes di girtîgehan de li hemberî wehşeta dewletê di grevên birçîbûnê de



vê rojê dijin, lê pişt re jî ji bîr dikin.

Cuntaya 12'ê rezberê 650 hezar kes hildan bin çav, 1.638 hezar kes bûne xwedî sabîqa, 210 hezar dawe hatin vekirin, 6.353 kes bi cezayê îdamê hatine darizandin, 50 kes hatin daliqandin, di nav wan de 27 kes bi fermana Kenan Evren hatin daliqandin û ji wan Erdal Eren hê 17 salî bû, doza ku çend caran jî dadgeha bilind vegeyriyabû di nava 3 mehan de tamam bû û Eren bi lez û bez jî aliyê generalan ve hate daliqandin. 14 kes



mirin û hin kesan jî wekî Mazlum Doğan, Eşref Anyık, Ferhat Kurtay, Mahmut Zengin, Necmi Öner ji bo ku berxwedan û protestoya li hemberî wehşeta faşîzmê geş biba xwe şewitandin.

Ji avabûna komarê heta niha tu tişt neguherî. Di destpêkê de qetlîama li hemberî kurdan pişt re bû nêçira çepgirî û kurdan ev hê jî bi vî rengî didome.